**Zargotin**

# *Mihemed HENÎFÎ*

**Û.. gurzeke dîtir ji zargotina EFRÎN ê**

**Daneheva: Pîr RUSTEM**

***Mihemed HENÎFÎ***

*Bi navê Yazdan ê dilovîn û dilovan.*

**Hemd û şukir ji Xwedê re**
**selewat ji Mihemed Mistefa re**
**Elî û eshabê wî giştika re**
**royê heft hezar car jê re(1)**
**Xwedê û ya Reb ekberî**
**selewat û selam tim li serî**
**Jêre hat wehî û kîtab**
**wan jî da me weiz û xîtab**
**Açiqkirin eyb û îtab**
**beyankirin xeta û sewab**
**Rokê bi emrê Elah û muîn**
**derbaskir Cebraîl emîn**
**Emrê Reb elalemîn**
**pir hewas kir Cebraîl emîn**
**Ji ezman dahat rûyê zemê**
**hatî hizora Mihemed emîn**
**Ne emrê herb û xeza**
**hatî emrê ceng û ceza(2)**
**Go ya Elî elmurteda**
**emrê Xwedê ji te re soze(3)**
**Go ya Elah, Reb elxefar**
**bi emrê Mihemed çar yar**
**Hezretî ELÎ li Dindilê bû sîwar**
**raki şûrê xwe yî Zulfiqar**
**Go ya Elah ya sitar**
**go ya ezîz ya xefar(4)**
**Êkê here dîn ezar kê**
**kê qebûl kir bikê dost û yar**
**Berê xwe da diyarê kifar**
**kafira bike talan û tar-mar(5)**
**Wexta Elî ji Midînê bi rê ket**
**gelek eshabe rabûn pê ket**

**Çavê Mihemed Henîfî lê ket**
**ew jî rabû, ew jî bi pê ket**
**Go ya şêrê Xweda; "ebî"**
**dilê min rabû çare nabe**
**Mineta min li ser te be**
**tu kê min jî bi xwe re bibe**
**Elî xwe ji Dindilê çekir**
**herdu çavêd lawê xwe maçkir**
**Dest hilanî due lê kir**
**suhbet û tenbîh lê kir(6)**
**Got: tu yî bi çûkî, law can fîda**
**tu damîş nabî li ceng û ceza**
**Hîn ne ferze ji te re xeza**
**tu here ji xwe re nav yaxorza**
**Ey cîgerê minî ezîz û delal**
**tu vegere here rûne li mal**
**Eger sebra te netê li mal**
**ji xwe re xewke bi eşq û xeyal**
**Şev dirêjbû; bû meh û sal**
**netê çava xewa zelal**
**Seyda rabû bi husin û cemal**
**Quran xwend bi ismê Celal**
**Nimiya sibêkir bi kemal**
**got ezkê herim awa xezal**
**Siwar bû rakir tîrkevan**
**berê xwe da çiya û çolan**
**Ji xwe re kir ger û seyran**
**dike awa teyr û heywan**
**Di bin re deşt bû, di ser re çiya bû**
**xezal ji pîşê rabû**
**Heywan rabû ew winda bû**
**aqil ji serî bela bû**
**Hin şewitî, hin jî pir şabû**
**got Xweda û ya Reb çi belabû**
**Hesret kişand meraq rabû**
**bi emrê Xweda û Elah bû**
**Got: ya Reb carek din bibînim**

**bi xweşî bigrim lê nexînim**
**Hedya bibim li xelkê bibînim**
**sebra dilê xwe pê hûnim**
**Bi xweşî bigrim vê şêrînê**
**bibim bajarê Midînê**
**Jin û mêr kesek nemîne**
**her kes werê ji xwe re bibînê**
**Pir lê gerî çare nekir**
**îza xezalê wî winda kir**
**Xezal derê, pir lê gerî**
**kemend çekir lê kir qîrî**
**Ji kemendê filitî paş xwe nerî**
**aqilê Mihemed Henîfî firî**
**Dest avêt tîrkevanê**
**êkê lêxînê li wê heywanê**
**Qêmîş nabe, dest narinê**
**dibê ya Reb tu zanê**
**Kevan danî kemend rakir**
**dîsa xezal, wî winda kir**
**Pir lê gerî çare nekir**
**qoriya gêwir beyan nekir**
**Ket qoriyê, xezal sekir**
**xezal nedî çare nekir**
**Delxa eşqê lê zêdekir**
**di cih de rûnişt, gavek çenekir**
**Xewê li fikrê xelibkir**
**hespê xwe berda bi xwe jî xewkir**
**Mebê qoriya gêwir-şer**
**dused siwar begcî li ber**
**Di sere narê çûkî pere**
**bi şev ordî-ordî digere**
**Qoriya gêwir bi dar û biye**
**di bin re deşt û di ser re çiyaye**
**Mihemed Henîfî di xew de maye**
**bi serde hatî dewriya dijmine**
**Hatin li dorê sekinîn**
**li hev nerîn bi hev re kenîn**

**Fereh, fereh li dora wî gerîn**
**xayîn-xayîn li wî nerîn**
**Ji ku hatî ev lawikê dîn**
**ji me re hespê hişîn**
**Wexta husin û cemala wî dîn (dîtin)**
**ecêb man, aqil firîn**
**Li hev rûniştin, bi hev şêwirîn**
**gotin: me wek vî camêrî nedîn**
**Hev melîke ne însane**
**ne beşere, ev ruhane(8)**
**Çi ecêbe kes nizane**
**ya sitar û ya rihmane**
**Çaxa wan bi hev re dendikir**
**ji xew rabû li dora xwe nerî**
**Li dora xwe dît dused siwar**
**wek çêlikê şêra li dora xwe nerî**
**Vêra gotin: ey mehbob can**
**tu li çi digerî li van deran**
**Tu melîke lê însan**
**xwe ji me re bike beyan**
**Ew rabû ser xwe ji nav wan**
**got: ne melîkim, ez însan**
**Ji xwe re digerim li aw û seyran**
**hûn jî xwe ji min re bikin beyan(9)**
**Bi hev re gotin: huske, huske**
**virde were tu can xelaske**
**Hespê bide xwe xelaske**
**derb û teina tu derbaske**
**Mihmed Henîfî got: şorê zêde bi min re nekin**
**edebê xwe mehfezekin**
**Tiştî ji min omîd mekin**
**herin li îşê xwe hûn sekin**
**Mekin şorê ne bi ciye**
**heqê we li hespê min çiye**
**Li hembera we jî însane**
**biçûke pêlewane**
**Hew ewladê lawê şêrane**

**siniye û mislimane**
**Gotin: tu nizanî ev qoriye**
**ev ne ciyê her kesiye**
**Dused siwar li ber begciye**
**mezinê me tabotciye**
**Tebot got: tu were şorê zêde meke**
**qulaqê me ker neke**
**Tu were destê Tabot maçke**
**li ber biger ê te afkê**
**Mihmed Henfî got: ey gawirno mekin lafa**
**bavê min Eliye Elmurteda**
**Cidê min Mihemed Elmustefa**
**bi min mekin zor û cefa**
**Çaxa wan axnemîşnekir**
**dused siwar çêwirmîşkir**
**Mihmed Henîfî çi îşkir**
**di seetekê de îşê wan bêtmîşkir**
**Mihmed Henîfî şêrê bi nîşan**
**siwar bû bi heybet xwe berda meydan**
**Bi heybeta Elî Elmurteda**
**saykê gurek kete nav pezê**
**Dused siwar gî qurmîşkir**
**serê begê wan kêsmîşkir**
**Rêka Midînê wî dûzmîşkir**
**zikir, tewhîd lê olmîşkir**
**Serê begê wan hanî**
**li orta bajêr nîşandêrik danî**
**Ê ku dî ecêba xwe hilahnî**
**kesî nedîbû ji kuderê hanî**
**Elî ji cengê fitilî**
**serî li orta bajêr dî**
**Belê çi qoçe, çi seriye**
**yî qasî serî kerekiye**
**Got: ev seriya kê aniye**
**li orta bajêr daniye**
**Min pir serî gawira qutkiriye**
**weke vî serî min nediye**

**Gotin: Mihmed Henîfî**
**ji sê roya bi şûnda bi xwe re aniye**
**Elî hat rûnişt li mal**
**Mihmed Henîfî bi naz û delal**
**Hat hizorê bi edeba kemal**
**jê kir pirs û cewab û soal**
**Got: hev çi îşe cîger delal**
**doxir bibê bi ismê celal**
**Got: bavo weke te îzin dayî**
**ez çûm awê, min xezalek dî**
**Xezal çû li paş xwe nerî**
**aqil ji serê min firî**
**Çi xezal bû, çi xezal bû**
**pir şîrîn bû, pir delal bû**
**Hew ne xewn bû, ne xeyal bû**
**bavo bi emrê Rebê zo Elcelal bû**
**Wexta xezalê serê min dî**
**ji xwe wêde heywan revî**
**Eşqa dilê min li ser firî**
**ez sekinîm min li pê nirî**
**Xezal çû, ez diketim dû**
**di ser çiya re hew aşmîş bû**
**Di qoriya gêwir de hunda bû**
**aqil ji serê min bela bû**
**Li qoriya gêwir ez peya bûm**
**ez helak bûm, pir westiya bûm**
**Bi sewt û dengê wan ez şiyar bûm**
**rabûm ser xwe min deng lê kir**
**Bi hev re kirin huske-huske**
**virde were tu xwe xelaske**
**Hespê bide, xwe xelaske**
**derb û teina tu derbaske**
**Aman bavo me li ber hev da**
**wan digot min cewab da**
**Wan xwe ji min re hewal neda**
**dilê min tirsî û xeyal neda**
**Yek ji min, yek ji wana**

**em rabûn hev bi zimana**
**Dused siwar ket meydanê**
**sire hat şûr û kevanê**
**Bavo tu were a vana**
**kalo tu were aman-amanê**
**Ez diketim ceng û meydanê**
**hanî bazara seriya û cana**
**Aman bavo min çi îşkir**
**bi tîrkevanê min kêşmîşkir**
**Dused siwar min şaşmîşkir**
**min yek nehêşt, gî qurmîşkir**
**Min neir kişand, kir vivan**
**birîndara kirin aman(10)**
**Xwîn meşiya li ser erdan**
**ew seriyê te dîbû seriyê begê wan**
**Elî got: li binê yek beg**
**got: bi heyran çavê te yê reşbelek**
**Tu gule min ke li min seke**
**got: aman cîger cak (carek) din we meke**
**Gawirê Tebot rabe**
**eskerê wî vê hesabe**
**Tuyî biçûke tu hîn xeşîme**
**got: paşê çare lê nabe**
**Gawir gî bi min re dijmine**
**min dinya sorkir bi xwîna wane**
**Min xirakir diyarê wane**
**min windakir warê wane(11)**
**Min pir mêr ji wan dikuştin**
**min pir jin vê mêr hêştin**
**Heta bi roya qiyametê**
**xwîna wan ji erdê netê şuştin**
**Hewna gî (ew te) ji min bikînin**
**eger fersendê li te bibînin**
**Ê canê te pir bêşînin**
**ê kezeba te pir bişwetînin**
**Aman oxlim tu cîgere**
**tu bi ruhê min re bere-bere**

**Got: ew ne xezale, law cîger**
**aman-aman cak din wêda mere**
**Li pîşa te xwe kir xezal**
**aman-aman ew xeyale**
**Nesîheta min li te be**
**tu gul min ke, tu poşman nabe**
**Eger tu çû awê, sêdê**
**ji Betmanê derbaz mebe**
**Nesîhetkir Heyder kirar**
**cîger hestiyê xwe Zolfeqar**
**Hezretî Elî li Dindilê bû siwar**
**berê xwe da diyarê kifar**
**Hesen, Husên birin bi xwe re**
**Mihmed HENÎFÎ maye ji par re**
**Aqil çûye bi xezalê re, xewa xwe netê**
**dibê ya Reb kîcax sibe bibe**
**ku ez derkevim seydê û awê**
**ez ketim vê sewdayê**
**ji vê sewdayê xewa min netê**
**sibe vehat û rok xweş hilat**
**siwarbû bi heybet, ew rabû bi rê ket**
**kemend rakir bi orta çiya ket**
**Îz hilîna bi pê reşiyê ket**
**xezal rabû bi pîşê ket**
**Kemend çekir li piştê ket**
**xezal jê revî bi orta çê ket**
**Nedihêşt gelî û newal**
**ji teina re meisûm ziman bû lal**
**Omidî birî nedî xezal**
**dîsa çû ket nav qoriyê**
**Vê neqilê hezar gawir li ber qoriyê**
**rastê hatin li dewriyê**
**Xeber didan hev bi boriyê**
**dora meisûm wan hilanî**
**Deng û gaz li hev danîn**
**şûr û kevan wan hilanî**
**Lê hatin hev dijminê dîn**

**vêre gotin: ey pêlewan**
**Tu çi digerê li van deran**
**tu çeke şûr û tîrkevan**
**Were teslîmbe xelaske can**
**Mihmed HENÎFÎ şêrê bi nîşan**
**Got: ey gawirno mekin lafan**
**ez nehatim herb û cengan**
**Ez ji xwe re digerim li awa seyran**
**min xezalek xwe hindakirî**
**Bi eşqa wê re aqilê min firî**
**xeyala wê fikra min birî**
**Hûn xelaskin can û serî.**

**Gotin: here cem begê me**
**ê te afkê ji xemê**
**M. Henîfî got: ez begê we qe nasnakim**
**destê gawira ez maçnakim**
**Dînê Mihemed sivik nakim**
**ji pûta re secde nakim**
**Ecdadê min kesî we nekir**
**ji gawira re hirmet nekir**
**Ji pûta re scde nekir**
**wexta mesûm ev şora kir**
**Hezar gawir çav li hevkir**
**giştika bi hev re hicûmkirin**
**Mesûm perîşan, ziwankirin**
**gotin: ev pêlewane**
**Lêxin medin wî meydane**
**ev siniye, mislimane**
**Li ser me pir nîşane**
**ev çêlikê dijminane**
**Pêlewan can qurane**
**ordî tev de pênikane**
**Hele sekin li zendane**

**Hina gotin lê mexînin**
**hûn vayî bi kemendê xînin**

**Banêkin şalê hûn vêxînin**
**ji Tebot re hûn bişînin**
**Mihmed Henîfî got: ya Xwedê**
**tu nesir û qowetekê bidê**
**Tu sur û hêbetekê bidê**
**ya Reb tu qudretekê bidê**
**Bi navê Xwedê şûr kişand**
**çep û rast lê dixînê**
**Bi heybet neirê dikşînê**
**xwînê li erdê dimeşînê**
**Hespê di bera dibezînê**
**pêlewana ditirsînê**
**Şiir li meydanê dixwînê**
**navê Elah dizekirînê**
**Ew bi tenê kes ne li piştê**
**zend, destê xwe vedimiştê**
**Geh bi şûr û geh bi xiştê lêdixînê**
**heftê gawir ji wan dikuşt**
**Şûr hilanî û gurz rakir**
**ceinim bi canê gêwir şakir**
**Dused gawir bi gurz peyakir**
**gurz hilanî tîrkevan rakir**
**Dest avêt tîrkevanê**
**gawir dan ber nîşanê**
**Derbê wan dan ber qelqanê**
**hicûm, talankir nav wanê**
**Gawir sekir çare nebû**
**herkî çû ew zêdebû**
**Xedeb rabû koç lê nebû**
**êvar dahat ew sebeb bû**
**Bi birînkirin derb lêxistin**
**bi wî halî bi kemendê xistin**
**Bi dewheft (hefde) ciya bi birînkirin**
**canê nazik bi xwînkirin**
**Perîşan û ziwakirin**
**êrîş û mehzûnkirin**
**Werin vî halî, vî îşî**

**hêsirê zelal ji çavan diherikî**
**Xeber şandin ji Tebot re**
**gotin: me dijmin girt ji te re**
**Çi emrê te heye ji me re**
**em bikujin lê hûnin ji te re**
**Got: bigrin hûnin ji min re**
**ez wî bi çavê xwe bibînim**
**Bi destê xwe hêfa xwe hilînim**
**e ji bavê wî pir bi kînim**
**Bi destê xwe bi dardakim**
**ez laşê wî di erdêkim**
**Ez navê wî ji dinê rakim**
**ez dijmina li wî şakim**
**Meisûm anîn bi kêf û saz**
**bi kef û suhbet dinbil baza**
**Daraxace jê re venan**
**tu xelaske Rebê rihman**
**Çaxa meisûm li dara nirî**
**omidî ji canê xwe birî**
**Got: medad ya Reb û dagirî**
**got: îmdad bav û li rêkê nerî**
**Aqildar gî li hev hêwirîn**
**li hev rûniştin bi hev şêwirîn**
**Ji tirsa Elî re wan newêrîn**
**qerar nedan çav nebirîn**
**Gotin: paşa em ji te razîne**
**vî meisûmî bi dar mexîne**
**Çekin zîndanê bilezînin**
**şalê hûn wî biftilînin**
**Kuştinê wî ne çetine**
**ew eybeke pir mezine**
**Salê wî dewdudune**
**ew biçûke neyî mezine**
**Elî rêwiyê hedîse**
**eger va îşî bibîse**
**Ê ji nav me rakê Dêr û Kenîse**
**werin embozmîşkin va meclîse**

**Nav û nîşanê wî pirin**
**pêlewanek ji me tine**
**Li pîşa Elî bisekine**
**ev îşekî pir çetine**
**Ew pêlewanekî pir mezine**
**serê şûrê wî dudune**
**Hin dirêje, hin kine**
**ne polate ne hesine**
**Eger em vî bikujin**
**em xwîna vî birjînin**
**Paşê ne dimîne mêr û jin**
**ê kokê me wîne**
**Eger em vî ji rê bêxînin**
**ji ser dînê wî biftilînin**
**Emê pir îşa bibînin**
**dînê Mihemed emê hilînin**
**Saz û suhbet qarmîşkirin**
**qetil û ferman bozmîşkirin**
**Wana birînê wî gî kewandin**
**melhem kirin him şidandin**
**Xem û xeyalê wî revandin**
**koçek û sera xemilandin**
**Tebot got: law virde were**
**ji me re bide xweş xebere**
**Tu Erebe lê tu Fire**
**tuyî Faris lê tu Berbere(12)**
**Got: neyî Farisim neyî Berberim**
**Hîcazîme bi xêr û bêrim**
**Ez lawê Elî heyderim**
**torînê hezretî pêximberim**
**Wan rakir qedeha wî ya şerabê**
**gotin: bûrin fexe bi şifa be**
**Got: ez venaxim, ew herame**
**ev ne laiyq dînê meyî îslame**
**Heram dike heq-elaame**
**ev hedîsa xêr-elename**
**Ez venaxim ew mirdare**

**kesek ji me venexware**
**Kî vexe ew pîs mirdare**
**ciyê wî ceinim û ezab û are**
**Tebot got:hûn bilezînin**
**Mînê ji min re bişînin**
**Xeber dan şêrîn Mîne**
**kilîtê li sindoqê dixîne**
**Di zêr û zîv de xwe dixemlîne**
**gulya dişo bi misk û bîne**
**Mîne xatûn xemilandin**
**ji Tebot re şandin**
**Li hember lêwik disekinandin**
**husin û cemala wê lêdimandin**
**Ji saz û suhbetê kes namîne**
**giştik tên sêra Mînê**
**Mîne li meydanê disekine**
**ku, Mihemed Henîfî bi-ecbînê**
**Çaxa Mîne hat meydanê**
**giştik rabûn ser lingane**
**Ya sitar û ya sibhane**
**ew çi rinde, ew çi cane**
**Beden zirav ji dara sewliyê**
**çarde salî nuhgîştiye**
**Çavê reş û bi xwe sipî sewliye**
**norê îmanê li ser bêliye**
**Hevav sorin wek sêve**
**bi tertîbe dev û lêve**
**Enî gewre weke hêve**
**ez bi heyran bûk û zêve**
**Bi tertîbika pir girane**
**Mîne disekine li meydane**
**Tabot rabû ser lingane**
**bangkir go: ya pêlewane**
**Tu were şora min meşkîne**
**qedehê ji destê min hilîne**
**Dînê Mihemed biterkîne**
**ez bi tedim şêrîn Mîne**

**Mihemed merîkî sahire**
**hin kizab, hin şaire**
**Ew cazokî pir mahire**
**sihra wî li dinyayê bû şahire**
**Tim sîfîlî û serokdare**
**tim mihtacî, perîşane**
**Neyî zengîn xwenedane**
**ew sêwîkî derwîşe**
**Ez bi tedim xezîna zêre**
**bax û baxçe, milk û xêre**
**Kawîza hesp û şêre**
**qaz û ordek, qumrî û teyre**
**Çiqa beg û emîr hene**
**giştik li dora wî û Mînê ne**
**Hinek derin, hinek têne**
**giştik xwezgênciyê wê ne**
**Didin min vê hesab zêra**
**memleket û bajara**
**Mîne qîzek pir çelenge**
**li dinyayê bi nav û denge**
**Nîşana horiya lê bûn renge**
**li ser bûn herb û cenge**
**Mihmed Henîfî go: tu were min bi dengkirin mede**
**ser birînê min vemede**
**Birînên min dêşin zêde-zêde**
**ez nabim, Mîne bi şûnde**
**Tabot go: tu di bin re çava rake**
**tu şora min di guhê xwe re ke**
**Tu vê rindê bi qismetî xwe ke**
**dil û canê xwe pê şake**
**M. Henîfî go: nabim, nabim Mîne nabim**
**li cinetê bi horiya şabim**
**Ez bi keder, bi ezabim**
**bi îznê Xwedê bi xwe re bim**
**Nabim Mîne, qebûl nakim**
**ez dînê xwe betal nakim**
**Ez bavê xwe zelîl nakim**

**ez cidê xwe melûl nakim**
**Nabim, nabim tine fêde**
**birînên min dêşin zêde-zêde**
**Kî qîza te dixweze**
**here bi xêr pêde**
**Li dinyayê kêfê min netê**
**esil kêf kêfê cinetê**
**Ji min meke vê minetê**
**ev îşa li hesabê min netê**
**Dînê xwe nadim bi hezar Mîne**
**ez bi birînim, law min mêşîne**
**Ez nexweşim min meecizînin**
**herin îşê xwe bibînin**
**Tebot sekir fêde nekir**
**wî dînê xwe terknekir**
**Qedeha şerabê ranekir**
**şeytên ar û xedeb dada**
**Emir dabû wa celada**
**îmdad werê ji Xwedê da**
**Tebot go: rabin vî dardakin**
**laşê vayî di erdêkin**
**Ya zihêrinê bi serdakin**
**zû ji hemberê min rakin**
**Meclîsê li çavê hev nerî**
**bi dizî bi hev şêwirîn**
**Qerar nedan çav nebirîn**
**ji tirsa Elî wan newêrîn**
**Gotin: eger kî wî bi dardakê**
**Elî navê wî ji dinê rakê**
**Şûr-neçel bi dest xwe ke**
**werê pergala we belakê**
**Rabûn birin çekirin zîndanê**
**nan û av nedanê**
**Gotin: bila herê gul-xewnê**
**heta bi xwe werê îmanê**
**Go: Mîne çû mal daqim danî**
**eşq û sewda ew hilanî**

**Go: aman ya Reb tu zanî**
**tu bikê hevalê vî canî**
**Çi mehbûbe çi cane**
**ew çi şêrîne û pêlewane**
**Ji derdê wî re bû dîwane**
**ji eşqa wî re bû perwane**
**Ji neslê pake û xwenedane**
**ew muimin û mislimane**
**Sebir û halê min nemane**
**can û seriyê min qurbane**
**Heta êvarê bisebirim**
**bi derdê eşqê bidebirim**
**Bi derdê wî ez bimirim**
**di xwe bibihurim ez binirim**
**Sebra Mînê netê ku**
**kîçax êvar dayê**
**Ku ez çarekim vê sewdayê**
**Xwedê dewleta bavê dayê**
**Êvar dahat reş bû cîhan**
**ket xew cimle însan**
**Mîne rabû çû ber zîndan**
**jêkir serê begciyê zîndan**
**Gulêdinê li ber zîndanê**
**sekir dixwînê Quranê**
**Di bere dikşîne kûr nalanê**
**dikê li ber candanê**
**Meisûm dixwînê Quranê**
**Quran xweş tê li Mînê**
**Sebir û qurar li ser namîne**
**tirs û hesab li ber namînê**
**Eşqa Mînê hîn zêde kir**
**dengê Quranê fêde kir**
**Kevirê ji deh qentaran**
**ji ser devê bîrê bi tenê çekir**
**Kemend berda zîndanê**
**Mihmed Henîfî jê dertînê**
**Şehadeta xwe hilanî**

**misliman bû ew hat îmanê**
**Go: le Îlah île Alah**
**heq Mihemed resûl Ellah**
**Rabû du hesp anîn**
**hekîb ji zêra wan dagirtin**
**Çaxa ji bajêr bi rêketin**
**rê û yolaq bi berketin**
**Toz û dûman bi ser ketin**
**berve Midînê bi rê ketin**
**Mînê go: ya Hîcaziyo**
**navê te xweş bi xêr çiyo(13)**
**Tu lawê kê û tu kiyo**
**şalê tu lawê Eliye**
**Go: ez Mihemed Henîfîme**
**ez lawê hezretî Elî me**
**Lawê Henîfa Romî me**
**ez ji neslê Haşmî me**
**Mînê go: hemd-lah ez ne poşmanim**
**ez pûka pêlewanekî ciwanim**
**Bûka pêximberî axir zemanim**
**le Îlah île Allah ez mislimanim**
**Mînê dikr şêwir tas**
**teqdîm dikir guliyê taz**
**Ji Mihmed Henîfî xweste miraz**
**pir kêf, ew pir şaye**
**Mihmed Henîfî go: ya Mîne**
**tu şora biterkîne**
**Ez mislimanim li pîşa me**
**ew rêka dîne**
**Dînê me dînekî temîze**
**mezhebê me pir ezîze**
**Terîqeta me pir lezîze**
**vê nikeh ji me re ne cayîze**
**Wexta em bi xêr gîştin Midînê**
**cidê min nikeha me derîne**
**Şiyê heram li me namîne**
**her kes miraza xwe bibîne**

**Heta te li xwe nikeh nekim**
**ez destê xwe bi te nakim**
**Bi çavê xerap li te senakim**
**emrê terîqetê ez çenakim**
**Sibe dibû siba rihmet**
**îş açiq dibû beyane**
**Laşê begcî li ber zîndane**
**serî hatî ber lingane**
**Xeber dane qerêl**
**qulaq lê sor bûn bûne sêl**
**Li serî qij bû por, simbêl**
**kir qîre wîle wîl**
**Wexta Tabot xeber rakir**
**ax hilanî bi ser xwe kir**
**Gaz û hawar li ewîla kir**
**xeber li dora xwe bela kir**
**Go: aman zûbin bilezînin**
**hezar esker zû bi pêxînin**
**Wî bikujin Mînê hûnin**
**hûn kesî pê mehesînin**
**Hezar esker gî bi qabûtin**
**bi şûr, mertal bi labûtin**
**Hespê wan lîwan çûtin**
**giştik ebdê senem-pûtin**
**Goz û niqare lêketin**
**hezar siwar bi pê ketin**
**Hesp ajotin bi pê ketin**
**ew bela bûn bi çê ketin**
**Hezar esker li kuştinê**
**li xwestinê li girtinê**
**Bi pê ketin wan fixangî**
**gawira nêzîkî li wan kir**
**Mihmed Henîfî hesabê wan kir**
**go: meded ya Reb carekê bankir**
**Mihmed Henîfî go: ya Mîne**
**metirs xema qet mekşîne**
**Îmdad Reb elalemîn**

**mided ya Mihemed emîn**
**Bi emrê xaliq elbarî**
**ez natirsim ji hezarî**
**Ez di navkevim ew zirare**
**tu rûne sêrke li vî warî**
**Ez bikim bilezînim**
**pir ecêba li wan bimînim**
**Şûrê heq ez bikşînim**
**serê wan bifrînm**
**Mihmed Henîfî li wan fitilî**
**tabû tev li hev xurcilî**
**Meydan ji neirê di-edilî**
**xwîn ji birîna duxul-xulî**
**Neir kişand kire qîrî**
**îmdad werin melek sêrî**
**Kurê biçûk ket nav kerî**
**Mînê li wira dagirî**
**Gawira gotin: ya mihmedî**
**me wek te ti ecêb nedî**
**Vê neqlê umrê te jî qedî**
**tê ço xwe xelaskê ji hezarî**
**Law decal, te çi îşkir**
**ordî tev de, te bozmîşkir**
**Tu qiçkikî dewdu salî**
**te em kirin çi halî**
**Tu ne bi tenê, law tu neyî xalî**
**wek dêwa tu dinalî**
**Mihmed Henîfî şêrê bi nîşan**
**bi heybet cewab da wan**
**Go:Ey kevirê bê dîn, îman**
**ez lawê şêrê Yazdan**
**Hûn bandikin pûtê zeman**
**kevirê hişk, dare vê can**
**Ez bandikim Elah û Rehman**
**ew xwednê zemîn û ezman**
**Ey kafirler hûn wemekin**
**cava rakin li min sekin**

**Hûn sîleha, şûra çekin**
**hûn destê xwe bi min mekin**
**Li salê min hûn semekin**
**şorê ne rind hûn mekin**
**Ya îslam bibin werin îman**
**ya hûnê bi destê min bimirin**
**Delxa min rabû pir şadibim**
**ji seriyê we re ez celadim**
**Ez merîkî pir eynatim**
**heta nemirim Mînê nadim**
**Bibêm ya Elah ez bangkim**
**meydanê gî bi serî û cankim**
**Can û malê we talankim**
**Mînê nadim, we bi qurbankim**
**Van şorina têkar kirin**
**di ber xwe ve çûn, wan e`ar kirin**
**Hesp ajotin lê xarkirin**
**êriş kirin kum xar kirin**
**Hicûm kirin aman-aman**
**ketî e`rdê toz û dûman**
**Kafir û dijmin vê dîn îman**
**nema rihmet ne jî ûjdan**
**Hew bi tenê hewna hezar**
**hew tên îman ehlî kifar**
**Gî pêlewan, zalim, cebar**
**îmdad wey Heyder kirar**
**Ket nav wana şêrê bi çek**
**damîş nabe û mulûk**
**Ketin herba law, zave û bûk**
**bozmîşkirin tabora mulûk**
**Çep û rast lêdixînin**
**ji ser hespa difirînin**
**Di ce`nimê de wan dişewtînin**
**ne`r-ne`ra dikşînin**
**Hefsid di bin şûr re derbas dikir**
**jê sed revî xwe xelaskir**
**Hale dijmin wî qiyaskir**

**ji xwedê re hemd û îxlaskir**
**Hatin ji tabot re beyankirin**
**hesp şidandin lîwankirin**
**Tabot wekî kera zirî**
**ji text û taca omidî birî**
**Aqil, tedbîr ji serî firî**
**li pêlewana kiriye qîrî**
**Komkir çar hezar pêlewan**
**giştik filan ibin filan**
**Bi sur û heybet bi nav û nîşan**
**ket nav wan û bû fixan**
**Go: Kî serî wî ji min re hûnê**
**ezê bi wî dim şêrîn Mînê**
**Eger bi xweş ji mi re hûnê**
**bila were li ser text rûne**
**Gî siwar bûn li hespa nîştin**
**li deştê ji para gîştin**
**Şûr û pala xîşte-xîşte**
**siwara peya li şûn xwe hîştin**
**Li wêderê bûn çar tabû**
**hink bi rum, hinek bi şûr hin bi gurz, hin bi labor**
**……………………**
**tu xelaskê rebê xefûr**
**Hin li fikrê text û taca**
**hin li fikrê bûk û zava**
**Hesp didan ber qurbaca**
**bela bûne li deşt qiraca**
**Ji çar yalya de hicomkirin**
**lawik perîşan û zîwankirin**
**Canê nazik bi xwînkirin**
**me`sûm melûl û mehzûnkirin**
**Mîne xatûn bi girî û şîn**
**canê nazik tevde bibirîn**
**Mele`ûn kafir tabot vê dîn**
**li pêlewan dikir qîr**
**Hew bandikê lêdixînê**
**M. Henîfî ne`ra li ser ne`ra dikşîne**

**Xwînê li e`rdê dimeşînê**
**piştê li wan dişkînê**
**Hin bin birîn hinek mirin**
**hina sîleha xwe çekirin**
**Hin revîn canê xwe xelaskirin**
**deşt û çiya derbaskirin**
**Tabot ji para (piş ve) yamankir**
**def lêxist herb îe`lnmkir**
**Zar û firya, ax amankir**
**sed-hezar e`sker komkir**
**Hin siwar kirin hin meşandin**
**ket pîşa e`skerê û kişand**
**Kafirî mele`ûn, dînsiz, zalim**
**can nazik zêde êşandin**
**Tabot, ordî ji para îmdad gandê**
**gî (giş) bi te`lîm û e`limandî**
**Sed-hezar gî bi hev re şandî**
**bîraqa sor verşandî**
**Hin bi şûr, hin bi mertal**
**hin bi rum, hin bi pale**
**Hesp rabûn ser çar nala**
**birîndara nale-nale**
**Hin bi gurz, hin bi qelqana**
**hin bi ewqa, hin bi tîrkevana**
**Şîqirtî derê qatê ezmana**
**tu were hale pêlewane**
**Çi însaf û çi ûjdane**
**çi merhemet û çi îmane**
**Xwedê û ya reb tu zanê**
**tu xelaskê, tî rihmane**
**Pêlewan hesp ajotin**
**meydan xwestin, xezel gotin**
**Li meydanê can firotin**
**kelîma tewhîdê ne digotin**
**Siwar bû xwedanê hespê bezo**
**ket meydana ceng û ceza**
**Saykê gurek ket nav peza**

**bi canê wan kirin zor û cefa**
**Laşe li e`rdê peyakirin**
**gî mehcûb û riswakirin**
**Kafir pirin paşî netê**
**sed dimrê, sed zêde dibê**
**Me`sûm bi tenê, kesik netê**
**Xwedê pêdê nisretê**
**Wexta herb giranbû**
**meydan bi toz û dûman bû**
**Qîret hatî, Mîne rabû**
**xwe şidand, ew siwar bû**
**Go: Dijmin pir bû ez nemînim**
**ez jî rabim xwe pêgînim**
**Bêm ya Elah ez lêxînim**
**ez kafira ji ser bikşînim**
**Melayîkê wana pirin**
**li ber geriyan, kirin aman**
**Tu were mekşîn xema**
**bi wî nikanin ehil cîhan**
**Tu were rûne temaşeke**
**a erdê tevde belaşke**
**M. Henîfî go: ya Elah, wî şûr kişand**
**çep û rast lêxistvewşand**
**Xwîna sor li erdê meşand**
**selawet û tekbîr kişand**
**Tabot rabû bi qeir û xedeb**
**go ey eskerê bê edeb**
**Bi me dikenê qewmê Ereb**
**li ser min nema nav-neseb**
**Ear û namûs bi we ra tine**
**hûn sed-hezar can-mêrin**
**Hûn bi qiçkikî nikanin**
**li qarşiya we giya disekine**
**Go: ka hew qîza min bir**
**dijmin li min şakir**
**Text û eywan li min belakir**
**navê min ji dinê rakir**

**Him eskerê min qirmîşkir**
**hin namûsa min bozmîşkir**
**Aman-aman vî çi îşkir**
**qîza min qandir mîşkir**
**Wexta Qerêl lome kirin**
**giştika bi hev re hucûmkirin**
**Meydan lê barandin**
**di xwîna sor de pir tenik kirin**
**Tîrkevan lê barandin**
**denk û nere dikşandin**
**Kemend li dorê verşandin**
**canê nazik pir êşandin**
**M. Henîfî go: ya Elah ya Xewdê**
**tu nesir û qowetikê bide**
**Tu sur- heybetikê bide**
**tu îmdad û himetikê bidê**
**Bide birînên min pir bûn teqet nema**
**xwîna min pir çû qowet nema**
**Xwedê û ya reb li qewlê te ma**
**tu xaliqê erd û sema**
**Pir dagirî go ah û wah**
**go meded ya Reb û ya Elah**
**Tu çi hakim, tu paşayî**
**ji te meded ji te paşa**
**Elah tu xeberê min pêgînî**
**bav_kal, îmdada min bişînê**
**Halê min nema li nav kafira**
**îmdad were zû bira**
**Dibûm berx li nav gawira**
**min xelaske ji destê kafira**
**Kafir pire paşî netê**
**ez bandikim îmdad netê**
**Meded berî şerîetê**
**îmdad bavo tu kê netê**
**Ez nexweşim bi birînim**
**ez bi girî, ez bi şînim**
**Rê dinirim kes nabînim**

**teqet nema gi ez lêxînim**
**Ditirsim li vir ez bimînim**
**bav –kal ez nebînim**
**Anê-anê tu nav şêrînê**
**ma tu xewnekê qe nabîne**
**Aman bavo min gul te nekir**
**nesîheta te fêde nekir**
**Birîn pir bûn xwînê zêdekir**
**xwedê, Elah ya Reb şukir**
**Xwedê tu bi min gînê**
**medad ya Reb tu halê min zanê**
**Wexta wî gurz rakir**
**kezeba Mînê di biriyan**
**Wî jî gurzê xwe kir fîxan**
**go: meded Elah aman-aman**
**Go: Elah tu min dibînê**
**bavê min Elî ji min re bişînê**
**Ji destê kêwir min bi derxînê**
**tu mirazê me bi hevgînê**
**Tabot go: Hûn bilezînin**
**îzê vayî biqedînin**
**Berî Elî xwe pêgînê**
**wî bikujin Mînê hûnin**
**Heyfa nan û nemetê min**
**heyfa kinc û kiswetê min**
**Bi qiçkikî hûn nikanin**
**ji we ra eybe, ji we ra eare**
**Heyf ji we ra hezar carî**
**ka Rustemê weyî xedar**
**Bejin dirêj wekî minare**
**hîro roya teng û dare**
**Hîro roya reş û sare**
**hîro roya ey xedare**
**Bila werê bike care**
**heger Elî bi wî gînê**
**Ê xelaskê wî û Mînê**
**ê koka we giya hûnê**

**Text û taca biqulbînê.**
**Rustem hat go: Ezî denim**
**pêlewanî çav hişînim**
**Sozê Mînê ka ez bibim**
**ez bi xweşî ji te re hûnim**
**Go: Êvar bû wext nema**
**tu here mekşîn xema**
**Mekşîne ezî qetalim**
**ezê biqulbînim ça û çema**
**Ez Rustem, Rustemê zalim**
**wekî dêwa ez dinalim**
**Tu xema nekşîn ez qetalim**
**ez declaim, ez qetalim**
**Êvar dahat şev edilî**
**her kes li ciyê xwe fitilî**
**Erd ji xwînê dixemilî**
**ji bîna laşa erd gemirî**
**M. Henîfî filitî li Mînê**
**Mînê ji ser hespê ew danî**
**Birîn şuştin ji nêm û xwînê**
**derman dike dikewînê**
**Mînê birînê wî kewandin**
**melhem kirin û şidandin**
**Hêstir bi serda barandin**
**xem û xeyala wî revandin**
**Nanê xwe bi hev re dixwarin**
**melûl, mehzûn, ustû xwar in**
**Teslîmê xaliqî cebarin**
**li nav diyarê xerîb kifarin**
**Birîndara nale-nale**
**perîşan hew bê hale**
**Şev dirêje; meh û sale**
**îmdad were, bavê kale**
**Wî mesûmî xewkir bi melûl**
**Mîne xatûn bû qereqol**
**Li dorê fitilî sax him melûl**
**îmdad ya Mihemed, nebî, resûl**

**Nîvê şevê avdazkirin**
**bi hev re nimî niyaz-kirin**
**Ji xwedê rica û niyazkirin**
**giriyek xwînê dem sazkirin**
**Minet û rica wan jêkirin**
**îmdad xwestin, li rê dinirin**
**Gotin: Meded ya Îlahî**
**tu paşayî, tu paşayî**
**Ku meded çû tu bê nayî**
**tu me xelaskê ey Îlahî**
**Herduwa bi hev re mîna zoyê bilbila.**

**Birîn xedar, birîn kûrin**
**ji hêstirên cava kinc şilbûn**
**Dil û cîger ji ci hilbûn**
**go: aman bavo tu mirteda**
**Tu siwarê dindila bezo**
**li herb û ceng, li herb û xeza**
**Wer îmdada me bilmeza**
**amana me li ser te be**
**Eger şev û eger sibebe**
**li canê te eyane be**
**Himeta te li ser be.**

**Go: Kul melûl cîger mehzûn**
**aman-aman hûn gih çibûn**
**Beden bi birîn, kinc bi xwîne**
**Çavê me li rêka te çûn**
**Dibêm bavo îmdad netê**
**dibêm bira qowet netê**
**Dibêm kalo kesek netê**
**ji kê bikim minetê**

**Sibe dibû rok xweş hilat**
**meydan boşbû kesik nehat**
**Ne husa seyd û hereket**
**medad Xaliq ka-înat**

**Def û niqare lêxistin**
**Rustem ji odê bi derxistin**
**Nîşana Mînê wan vêxitin**
**sed siwar bi dorê xistin**
**Rustem bi eşq hat meydanê**
**hesp bezand, meydan danê**
**Go:Ya Mihemed wer meydanê**
**ya teslîmbe ya wer îmanê**
**Go:Ez Rustemim, Rustemê zalim**
**wekî dêwa ez dinalim**
**Pêlewanim ez qetalim**
**li dinyayê bê mîsalim**
**Ez Rustemim, Rutemê şakim**
**eger gurzê xwe ez rakim**
**Ezê qafê te belakim**
**navê te ji dinê rakim**
**Mînê go: Ya ibin Henîfe**
**tî (tu yî) bi birîn, tî deîfe**
**Go: Iznê dibêm bi min de ya xelîfe**
**bi heqê navê xwe şêrînê**
**Ez daqimê te li xwekim**
**ez şûrê te bi dest xwekim**
**Ez ban Mihmed ya cidkim**
**ji ber te ve can fîdadikim**
**Di pê te re ez nemînim**
**mirina te ez nebînim**
**Xwîna xwe li ber te birjînim**
**xêrî ji te miraz nebînim**
**Ev kafira bi oze**
**destçapik, pir sivike**
**Bedenê wî ji heft gaza**
**ditirsim me bêlê vê miraze**
**Meleûnekî pir xedare**
**gurzê wî deh qentare**
**Ew ne yeke, ew hezare**
**wî pir serî anîne xware**
**Wer em hesp bi lezkin**

**çiya, deşta em derbaskin**
**Paşiyê ordiyê bavê min netê**
**were min birevîn, em xwe xelaskin**
**M. Henîfî got: Ya Mîne**
**tu nav xwaşî, nav şêrîne**
**Eger tu Xwedê dihebînê**
**van şoran biterkîne**
**Tu revê li yaq min mebîne**
**derb û tena li min nexîne**
**Min bi Rustem metirisîne**
**tê naka Rustim bi xwe bibîne**
**Ez nexweşim bi birînim**
**lekan li yaq xwe nabînim**
**Te li şûnê xwe bişînim**
**ez bibim ya Elah û lêxînim**
**Xwedê me bi qidreta te**
**nebî me bi nisreta te**
**Dînê me bi heybeta te**
**tu mekişîne xem û qisaweta**
**Waxta dî em ketin tengiyê**
**siwarê xeybê ji mere tîne**
**Ji dijmin ve xûyan tine**
**ew melaîkê li erşane**
**M. Henîf şêrê bi nîşan**
**siwar bû bi ismê Xwedê û Rehman**
**Nîvro xwe berda meydan**
**got: Ey kafirler ner kişand**
**Wexta ner wî kişand**
**cîgerê Rustem wî êşand**
**Sur û heybeta wî şikand**
**çilo ji darê weşand**
**Go: Ey meleûn tu ne Rustem zal**
**tu sifteh lêxîne bi a dînê betal**
**Derba te kafirê qetal**
**hilîn çi dibe emrê Rebî celal**
**Rustem gurzê xwe hilanî**
**go: Ya Hîra ji jorda danî**

**Derba wî li boşiyê anî**
**sire hat wî eslanî**
**Wana şêst derb li hevdu xistin**
**pir hiner wan derxistin**
**Li şêst yakan wî eslanî**
**wî derba xwe lê rast anî**
**Kir di cih de ji jor de danî**
**şukir ya Reb tu rihmanî**
**Ya Elah û ya sitar**
**saykê minarak ji jor de anî xar**
**Tabot bangkir go: hawar-hawar**
**ev çi îş, ev çi bêtar**
**Desmal danî kir zar-zar**
**go: Kude herim qewm xedar**
**Li ser min nema şeref û ear**
**textê wî bû tar-mar**
**Go: aman zûbin gî bi hevkevin**
**ji heq vayî bi derkevin**
**Hicûm kirin kal û cana**
**bi tenê lawik wekî eslana**
**Lê barandin bi tîrkevana**
**tu xelaskê ya Reb herdu cana**
**Bi dengekî go ya Mîne**
**dua bike rast hilîne**
**Birînê min kûr bûne**
**sêrke ji xwe re min bibîne**
**Hemla li ser hemla lê dixîne**
**sihra li meydan dixewîne**
**Her hemlakê lê dixîne**
**bi heybet nerê dikşîne**
**Binda dilê wan diqetîne**
**laşa bi laşa disekinîne**
**Kafir kuştin vê hesab**
**tay û cîger bûn kibab**
**Xwîn herikî mayî tab**
**birîn vebûn, bûn ezab**
**Birîn pir zêde açilmîşbûn**

**tamarê xwînê baxlemîşbûn**
**Go : aman ya Reb kude herim**
**xêrî ji te li ber kê bigerim**
**Omidiya xwe nabirim**
**rêka bav-kal ez binerim**
**Bavo were, law bavo were**
**tî (tu yî) li qamê, lê tî li xêre**
**Tî li romê, lê tî li qesrêye**
**aman bavo zûbe were**
**Aman bavo halê min nema**
**çavê min li rêka te ma**
**Tu derbazke çiya û çema**
**ez westiyam teqet nema**
**Aman tu bilezîne**
**setekê tu xwe bi min gîne**
**Zol-fiqar tu bikşîne**
**aman bavo canî şêrîne**

**Elî fitilî ji kela tone**
**sê qonaq man bi Midînê gîne**
**M. Henîfî di xewnê de dibîne**
**sedikê digrî û dibasînê**
**Go: te xêre ya resûl El-lah**
**canê min fîda hebîb El-lah**
**Tu xêr digrî aman- ah**
**sebeb çiye ya padîşah**
**Go:aman Elî bibezîne**
**xwe bi topraqa Tabot gîne**
**M. Henîfî bi birîne**
**rêka te dinire canî şêrîne**
**Kafir, dijimin li ser pire**
**rê û yolaqa te dinire**
**Dijimin li dorê fire-fire**
**xwîn diherke, şerê-şere**
**Aman tu bike, bilezîne**
**şev û roya li hev-xîne**
**Ya zû here xwe pêgîne**

**ji destê kawira bi derxîne**
**Hesen, Husên çêlkê şêra**
**herduwa bibe bi xwe ra**
**Pêgîne cenga kawira**
**tu xelaskê cîger ji xwera**
**Tu dindilê bi çelqîne**
**qaçmakê, dudiwa tu lê xîn**
**Wexta Elî ji xewa şêrîn rabû**
**çav lê sorbûn xedeb rabû**
**Xwe şidand ew siwar bû**
**go: Aman cîger çi belabû**
**Siwar bû Elî şêrê Xwedê**
**Hesen, Husên herdu li pêbû**
**Qirbac lê xist, li Dindilê**
**xwe ji ci çekir dev da çolê**
**Ne go deşt, ne go çiya**
**herikî wekî av û gemiya**
**Kevirê çiya li bin heliya**
**zilzalbû, erd heziya**
**M. Henîfî bi hesret nerî**
**dinire kesek netê**
**Deîf bûye hus jê netê**
**rê dinire îmdad netê**
**Mîne digrî li xewletê**
**ez negîştim wê dewletê**
**Min nedî nebiyê wê umetê**
**e çi bikim sebra min netê**
**Mîne rabû pir dagirî**
**fir-fir li dora xwe nirî**
**Bang Xwedê kir li ber gerî**
**go: Meded ya Reb tu qadirî**
**Xwedê ya Reb tu mezinî**
**xêrî ji te Xwedê tine**
**Pût û senem batilin**
**çar kîtabê te doxrine**
**Go: Elah ya Reb ehed**
**bi heq hebîb te Mihemed**

**Ez misilmanim heq ebed**
**tu me xelaskê ya Reb**
**Ez bandikim Elah – Elah**
**ya Mihemed resûl El-lah**
**Ji qudreta te re maşe-lah**
**ji hikmeta te re sibhan Elah**
**Min dî sê siwr bi derketin**
**çi siwarinî bi heybetin**
**Neqşana wana bi elametin**
**ji rûyê wan nûr vêketin**
**Çi siwarin, çi xîdîne**
**hersê bi zirxê dawîdîne**
**Heybetê wana kesî nedîne**
**qasidî canê dijminê dîne**
**Ax çi siwarin, çi siwarin**
**bi sur û heybet û qadirin**
**Her yek xenîmê heft hezar kawirin**
**destê dijimin li wan sarin**
**Ewana bi husin û cemalin**
**bi edeb û bi kemalin**
**Herdu ciwan ecdadê kalin**
**ewna ewladin, ewna hevalin**
**Mîne rabû bi dengekî banker**
**wey dexîlo, wey amankir**
**Ew Elî, wana kemankirin**
**pirs û soal wî ji wankir**
**Go: Hûn siwarê ji xeybêne**
**gi hûn kiwarin, kiva têne**
**Ew pêlewanî ji cengê têne**
**ji me re navê xwe bêne**
**Elî bankir, go: Ya Mîne**
**ya nav xweş, ya nav şêrîne**
**Ji te re xeber û xweş mizgîne**
**Hesen, Husên ez Elî me**
**Ez Elî me ji te re mizgîn**
**Hesen, Husên zoyê bira**
**Qsidê canî va kawira**

**ka M. Henîfî çûkê bira**
**Ner kişand û qîriya**
**Go: aman Mîne dagiriye**
**Ka cîgerê min ew li kuye**
**ew xweşe lê miriye**
**Mînê go: Aman Elî tobe li paşe**
**meydan tev de bû laşe**
**Çava ji hêstira paşke**
**ne miriye, ne xweşe**
**Ji mêj dengê nerê netê**
**ez ketime qisawetê**
**Elî ajot bi heybete**
**Xwedê bi wî de nisretê**
**Hespê wî ji qudretê**
**şorê wî ji edaletê**
**Elî bankir ner kişand**
**erd û çiya wî hezand**
**Hudir zikê dijmin qetand**
**pî û basikê wan şikand**
**Elî nere pir kişandin**
**damîş nabe kawirê reşe**
**Zilzal ket ezmanê reşe**
**di heziya erd û erşe**
**Nera Elî dibû beyan**
**li M. Henîf dibû eyan**
**Acilmîşbû wekî rihan**
**germbû pê hat can**
**Qowet pê hat bû pêlewan**
**a çi elem li ser neman**
**Go: şukir ya Reb, Xwedê û Rihman**
**îmdad hatin heba şêran**
**Şukir ya Reb tu qadire**
**ev çi nerika bi awire**
**Eceb bavê min Eliye**
**xizir siwarê hespê qire**
**Elî bankir kir fîxan**
**xwe berda go ey teyrê doxan**

**Ê gi hat pîşê ne go aman**
**ket nav wan şêrê bi nîşan**
**Ner kişand kir qîre-qîre**
**li meydanê ew digerî**
**M . Henîfî bi çarlepa bervê çûbû**
**lingê dindilê maçkiribû**
**Şukir ya Reb mirazê min bû**
**bavê xweyî Elî bi xweşî dîbû**
**Tevilev bûn yirx û bez**
**dest û rûyê hev ramosan**
**Digîştin hev hersê bira**
**bi hev re kirin şukir û fîxan**
**Elî bankir go:Ya Rebî şukir**
**te mirazê dilê min kir**
**Li min nema xem û fakir**
**me herbik xweş bi cikir**

**M. Henîfî birîndare**
**canê nazik pare-pare**
**Tev de birîn, tev de are**
**pênc birîn ya pijmare**
**Berda dilê min gelek are**
**ev çi îşe, çi bêtare**
**Ev çi hale çi haware**
**ew ax li min çêkir bare**
**Beden tev de bi nêm û xwîne**
**ew zer bûye bû lêmûne**
**Siwar bû Elî heyder kirar**
**bi heybet kişand Zo-lfiqar**
**Ket nav qewmê zalim kifar**
**ner kişand û ya sitar**
**Go: Meleûn Tabot te li min çikir**
**te va îşa bi emrê kê kir**
**Ji canê xwe re te dijmin çêkir**
**te arek dada te xwe lêkir**
**Xafil mebe ezî tême**
**ez siwarê Dinilê me**

**Ez Elî şêrê Xwedê me**
**xwe xelaske ezî tême**
**Ez Elî tu mi naske**
**tê xwe ji dest mi ço xelaske**
**Derb û tena ço derbazkê**
**ezî hatim xwe xelaske**
**Ner kişand ket meydanê**
**Dindil rabû û erd pîvane**
**Kawir qirkir, nat îmanê**
**go meleûn Tabot wer îmanê**
**Serê te hatî firotanê**
**law tu xwe xelaske ya yamanê**
**Tabot bankir go: Heyat**
**çi ecêb bi serê me de hat**
**Ev çi bela, çi afat**
**bi serê me da hat**
**Go: Ya Hêla ya Lat û Menat**
**ji we îmdad, ji we necat**
**Eger li ser we heye keramat**
**beyan bikin hûn muicîzat**
**Çi pêlewan, çi qereçiye**
**çi sur û heybet li ser wi ye**
**Kes damîş nabê li benda wi ye**
**ew şêst Eli ye**
**Çi nikane lê binire**
**vê basik hespê wî difire**
**Elî lêxist li kawira**
**Hesen, Husên heru nûra**
**Herikî xwîna wan mirdara**
**zilzile ket nav kevir û dara**
**Elî go: Meleûn Tabot wer îmanê**
**li ciyê xwe bibe sultan**
**Ez bi tedim af û amanê**
**eynat mebe wer îmanê**
**Bila milkê te bi kesî nemînê**
**Hakim- ferman be li ser zemînê**
**Vê dînê betal bi terkînê**

**tu arê cenimê jî nabînê**
**Tabot go: Elî ez wenakim**
**dînê bava ez terk nakim**
**Ez şorê te înan nakim**
**bi destê zorê ez îman nakim**
**Ez tabot neyî hindikim**
**pêlewanekî pir sivikim**
**Tu şêrê Xwedê ez çibikim**
**şerfa min çû bi çibikim**
**Wexta tabot ev şorakir**
**wî Zo-lfiqar bi heybet rakir**
**Lêxist qafê wî belakir**
**cenim bi canê meleûn şakir**
**Tabot ket û mirdar bû**
**esker revî tar û mar bû**
**Hin îslambûn hin firarbûn**
**çi aman çi hawar bû**
**Hezretî Elî sahib quran**
**Husên, Hesen hedu ciwan**
**Ketin nav nedan aman**
**kirin nav wana fîxan**
**Hinek revîn, hinek mirin**
**hin îslambûn ew nemirin**
**Hin îxrac qearkirin**
**hina xwîna xwe mirdar kirin**
**Bi canê wana bû ezîmet**
**malê wana bû xenîmet**
**Dêr û kenîse xirakirin**
**camî li şûnê peyda kirn**
**Pût û senem bela kirin**
**gî şikandin xirakirin**
**Gî komkirin giştik anîn**
**elimandin telîma dîn**
**Yek ji wana re îmam danîn**
**yek ji wan re nîzam danîn**
**Îş û nîzam îcra- kirin**
**şert û şurût îqrar kirin**

**Mîne xatûn siwar kirin**
**rêka Midînê birwar kirin**
**Herb bozmîş bû li ser êvarî**
**ya Reb şukir hezar carî**
**Va nesir rihmet yarî**
**tu Celal tu Cebarî**
**Faela tenê, faela tenê**
**li ber Midînê ew hatin**
**Eshabe rabûn bervê hatin**
**bi tekbîr û selawetin**
**Gotin ehlen ya merheba**
**ehil resûl ehil eba**
**Hûn bi xêr hatin sed merheba**
**ya mirteda ya mihbeta**
**Sefera te mibareka**
**cewherê te mibareka**
**Fikra te mibareka**
**hidora te mibareka**
**Bi kêf û sihet peya kirin**
**naqn û nemet mehya kirin**
**Bûk û zave hene kirin**
**dilê Henîfê pir şa kirin**
**Ferş û herîr wan rêxistin**
**mûm û çire wan vêxistin**
**Defa terîqetê wan lêxistin**
**nikeh Mînê bi derxistin**
**Royê teng gî derbazkirin**
**horî, cinan giya dem sazkirin**
**Bûk û zave herdu avdaz bûn**
**herdu bi hev re bi mirazbûn**
**Xwedê mirazê me jî bike**
**dijminê me jî helak bike**
**Diyarê kêwir xera bike**
**dewleta wan jî bela bike**
**Faîlatin, faîlatin**
**paşiya kitaba me bi xêr hatî**
**Sir, fexir her ka-înat**

**ji Mihemed re hemd û selawat.**

***Eve hîkayeta Mihemed Henîfî lawê hezretî Elî.***

**…………………………………………………………………**

**Di hin cihan de û li ser zimanê hinek dengbêjan, yek dibîne ku, carina wan hinek movik an jî beyt kêm û zêde kirine. Mînak; ev beytên ku me li jêr danîne, têde eşkere dibe ku, cudabûn û guhertin çêbûne.**

**(1) Ji eshabê wî giştika re**
**royê heft hezar car jê re**
**(2) Anî emrê herb û xeza**
**anî emrê ceng û ceza**
**(3) Lî wî Eliyê ELMURTEDA**
**sîwarê Dinldilê, hespê beza**
**(4) Wey ya ezîz û ya xefar**
**berê xwe da diyarê kifar**
**(5) Kê qebûl nekir Zulfeqar kê**
**can û malê wan tar-ar kê**
**(6) Dest hilanî due lê kir**
**nesîhet û temî lê kir**
**(7) Sibebû rabû bi husin û cemal**
**Quran xwend bi ismê Celal**

**(8) Di hinek kasêtin dîtir de, ev malika jêr li efsanê zêde dibe:**
**Bi hev re gotin: melîke ne insane**
**giştik hêwirîn li hev kombûn**
**(9)Ji xwe re digerim li aw û seyran**
**ji xwe re digerim li çûk û teyran**
**Min tiştî we nebiriye**
**min tiştî we nexweriye**
**(10) Min neir kişand, kir fîxan**

**birîndara kirin nalan**
**(11) Min xirakir diyarê wane**
**min kûrkir çavê wane**
**(12) Tu Erebe lê tu Xeybere**
**tî Faris lê tu Tetere**
**(13) Mînê go: ya mihmediyo**
**navê te "yî" xweş bi xêr çiyo**

# Sitran û kulmên hine û zavetiyê

# GULA ZER

**Gula zer gula zer, gula zer lê gula zer**
**Gul peqî ji gupikê hate der**
**Bûm pêmpilîk firîm ser**
**Wexta min gulek bînkir, bîn bi heft tona hate der**
**Gula zer gula zer, gula zer gerdenê zer**
**Çi îş kiro ji heq hate der**
**Dîmî top û gulover**
**Qurban dîmê tey esmer, heyran dîmê tey esmer**
**Tu berfa devê newala, siya zinêr yanda ser**

***　　　*　　　***

**De yala Gulê yala, de yala gulê yala**
**Etar hat binê mala, Etar bankir desmala**
**Gul derketî ji mala, kirî destê desmala**
**Ji bo xwe û hevala**

***　　　*　　　***

**Etar hat mehhela jor, etar bankir benedor**
**Gulê rakir genimê sor, aş digerî dor bi dor**
**Tu keremke were jor, ji min re bike çiftek şor**

***　　　*　　　***

**Gula zer xemilandin, gula zer xemilandin**
**Di pencerê re li min mandin, di qêpi re revandin**
**Dil, cîgerê min êşandin**
**Ez helandim, şewtandim. Rêka tirba li min mandin.**

# XIZÊMÊ

**Leylê, Leylê, Leylê, Leylê**
**Sebeba umrê min ê Leylê**
**Lê anê xizême, lê dayê xizême**
**Sîngê min dêşê, gî xwîn û nême**
**Xwedê bi qismet kê, oy Xwedê bi nesîbke**
**Rinda ku ez dibême**

***   *   ***

**Lê anê şivane, lê dayê şivane**
**Li pêşiya miyane, li seriyê çiyane**
**Kulavî li piyane, çoyî bi dest dane, bilûrê li lêvane**
**Bi te şivane lê anê, bi min sultane**
**Eger tu min nadiyê: Her yane-yane**

***   *   ***

**Xizêm wendabû lê li deşta Ezazê**
**Xeberê bidin lê şêxê Darazê**
**Bila remlekê bavê lê berî limiyê û avdazê**
**Xizêm windabû li deşta Metîna**
**Xeberê bidin xocê Qerqîna**
**Bila remlekê bavê ji berî yasîna**

***   *   ***

**Lê anê min pêde, lê dayê min pêde**
**Qelengî min buxe, ji çar qurşa zêde**
**Eger tu min nedêyî, şûnê qijika cersiyê min lêde**
**Bê oxir be ji te re, here bi rêde.**

# SÎNEMÊ

**Lê sîno lê Sînemê**
**Dest malek çar qelemê**
**Law bira ezkê bimirim ji bo xatirê melhemê**

**Çi kaniya di koka til de**
**Min kola avê hilda**
**Şeva di nîvê şevê da**
**Ez geriyam li dinyayê tev de**
**Min xelkê nazik dî di xew de**
**Min sîng û berê wê tevda**
**Mêrik hate ji derva**
**Şorrik ji min re xeber de**
**Bûm kabciyê urfayê, hezar quriş min bi derda**

**Ezkê bimrim vê buharê**
**Kefenê min lawikî bi birin, law bira, bi destê yarê**
**Ezkê bimirim roka çara**
**Kefenê min lawikî bi birin, law bira, bi destê yarê**
**Yekê mala min danî, duduyan konê min pêça**
**Ez rakirim ser çar dara**
**Ez helandim, şewitandim bûm sêwiyê li ber dîwara.**

# ZAVE

**De zave, zave, zave**
**Mal şêrîn, malik ave**
**Hîn bûkê li mala bave**

***　　　　*　　　　***

**Zave ji mala bi rê ket**
**Lawik ji mala bi rê ket**
**Tajî, bocî bi pê ket**
**Dawa zibûn bi ber bê ket**
**Cavê xasiyê li bejnê ket**
**Huminî bi tolada ket**

***　　　　*　　　　***

**Hespê hemdê min boze**
**Rişmî daket ser poze**
**Tewlek-dudu da erdê bi toze**
**Hespê zêveyî kumête**
**Zîn û zeng ji polête**
**Tewlek da nav welête**

***　　　　*　　　　***

**De yarî Hemdo yarî**
**Sêvek du du henarî**
**Me kirî û xelkê xwarî**

***　　　　*　　　　***

**Hespê zêveyî qire**
**Tewlek da serê gire**
**gir î bi hîm û kevire.**

## TOSINO

**Aman aman Tosino**
**Can polatî ji hesino**
**Haydê lawko tî bi jino**
**Tu ne motacê mino**
**Law Tosino, law Tosino**

***   *   ***

**Rêkê kitix dudu ne**
**Yek papor yek hesine**
**Têra tê qelfek jine**
**Yara Tosin tê tine**
**Law Tosino, law Tosino**

***   *   ***

**Dilî min hiye-hiye**
**Ortê gundî me bi biye**
**Ser çilo bin sersiye**
**Xerbî biyê bi kaniye**
**Navî rindê Lutfiye**
**Xelqînê li ser seriye**
**Bi tek diranî zêriye**
**Bi fîstanî modeliye**
**Bi kemberê eyneliye**
**Sîng erdekî aviye**
**Min çand û kir pembiye**
**Pembî li xet ketiye**
**Min bir bajarê Helebê, çekir xana Ebsiye**
**Ton zêdeyî sediye, ristin û kirin deziye**
**Min anî Çayê Kurmênc û bû tentenê bêlgiye**
**Law Tosino, law Tosino.**

# MÊMA ŞÊ

**Ay lê Mêma, Mêma şê**
**Qaf qulê kelek boşê**
**Mala bavê Mêmayê, zoyê memka difroşê**

***          *          ***

**Mêma têye ji deştê**
**Çewre berda ser piştê**
**Ez ramûsim bîna xweş tê**
**Li dilê dê ne xweş tê**
**Ix dikê xwîna reş tê**

***          *          ***

**Hêva zerî li ezmana**
**Şewqê dayî dikana**
**Mêma têye ji çayê hana**
**Dikim herim pîşê, bistînim ramosana**

***          *          ***

**Kela Horî li banî**
**Di sera yayle û zozanî**
**Di bin re mêrge û kanî**
**Mal xerab wî Menanî**
**Kurm têkevin wî canî**
**Mêma ji çayê gewr anî.**

# KINÊ

**Hey lê kinê lê-lê, umrê minê way-way**
**Bi bedenê lê-lê, qandî minê way-way**

**Ez ne kinim lo-lo, ne dirêjim way-way**
**Ez kulîlka lo-lo, li benda rêzim way-way**

**Hey lê kinê lê-lê, horiya dinê way-way**
**Min kin dixwest lo-lo, nedan mine way-way**

**Ez ne kinim lo-lo, ne dirêjim way- way**
**Ez kulîka lo-lo, li nava lawa me way-way**

**Hey lê kinê lê-lê, umrê minê way-way**
**Ez te nadim lê-lê, bi malê dinê way-way.**

# LAWÎNO

**Hey lo lawo-lawîno**
**Gava te da Efrîno**
**Di pê te re girî û şîno**
**Hey lo lawo, lawîno**

**Di haydî yarim, haydî**
**Li şûna miqla çavzero**
**Min îro nan û dew dî**
**Di haydî yarim heydî.**

# NOFÊ

**Nofê hat û xwe li bakir**
**Leylê hat û xwe li bakir**
**Guçilê şalê çar takir**
**Mala xortan xerakir**
**Leylê, Leylê, leylê, leylê, Nofê-Leylayê.**

**Nofê hate di ber çiyê re**
**Leylê hate di ber çiyê re**
**Kumê Meraşê li yan xist, qorê zêra di ser re**
**Leylê, Leylê, Leylê, Leylê, Nofayê-Leylayê.**

**Hay lê Nofê-Nofayê**
**Tu bi fîstanî Orfayê**
**Ban te dikim tu nayê**
**Te ez helandim, şewitandim berdam va dinyayê**
**Leylê, Leylê, Leylê, Leylê, Nofayê-Leylayê.**

**Nofê wele tu pakî**
**Tu bi fîstanî du patî**
**Ban te dikim tu deng nakî**
**Dilê min lawikî şanakî**
**Leylê, Leylê, Leylê, Leylê, Nofayê-Leylayê**

**Nofa min hate govendê**
**Leyla min hate govendê**
**Dilê min helî li bendê**
**Wê serxoşê û sersendê**
**Leylê, Leylê, Leylê, Leylê, Nofayê-Leylayê.**

# EYŞÊ

**Ax lê Eyşê, meded Eyşê**
**Xanî qule ax diweşê**
**Kab şikîbê dakav hewşê**

**Eyş xezala ji beriyê rabû**
**Eyş delal ji beriyê rabû**
**Sarî û sekman li pê belabû**
**Eyş girtin û bi memika şabû**

***　　　*　　　***

**Eyşê dîsa, dîsa –dîsa**
**Kew firîne çûne lûsa**
**Eyşê dîsa, ,dîsa-dîsa**
**Eyşa min birin mecilîsa**
**Qelengê xwe çarde kîsa**

***　　　*　　　***

**Sêla reş û qeremanî**
**Li orta hewşa me danî**
**Şev reş bû min rê nanî**
**Kefa lingê min hilanî**

**Ax lê Eyşê, meded Eyşê**
**Xanî qule ax diweşê**
**Kab şikîbê dakev hewşê.**

# ZELXÊ

**Lê Zelxê, lê Zelxikê**
**Lê, lê, lê, lê, lê**
**Dil eşiqê, dil tenikê**
**Lê, lê, lê, lê, lê**
**Xwe li govendê li badikê**
**Dilê min lawikî şadikê**
**Hey lê, lê, lê, lê.**

**De wê de Zelxo wêde**
**De wêda gewrê wêda**
**Zelxo revî bi deştê de**
**Hene hiştî di teştê de.**

**Lê Zelxo, lê Zelxanê**
**Heşaşê kum li yanê**
**Ne ji vire, ji gundê hanê**
**Lê Zelxo, lê Zelxê, lê**
**Heşaşê kum bi têlê**
**Ne ji vire ji gundê Bêlê.**

# RÛTO

**Hey law Rûto qe nawo**
**Xanî ket û dîwar mawo**
**Rinda Rûto bi xelkê mawo**
**Dosta Rûto bi xelkê mawo.**

***   *   ***

**Pezê Rûto bi zengile**
**Ji wê de têye bi xule-xule**
**Rûtê min î bi eşqa dile**

**Rûtê min hat ji ser banê**
**Rinda rûto nehat ser danê**
**Rûtê min ma li benda cane.**

***   *   ***

**Hey law Rûto, wey law Rûto**
**Li nav qewaqa fîte-fîto**
**Kum-kulehî bi pirmûto.**

***   *   ***

**Serî mala bi çipile**
**Binî mala bi çipile**
**Rûtê min pez daxist axile**
**Rûtê min bi kum-piskule.**

# DEWKULÎN*

**Diglim-nagilim dew nabe, law**
**Dew sar bibe qe nabe, law**
**Rûnê li meşkê bela be, law**
**Malê li pîrê xera be, law**
**Diglim-naglim dew nabe, law.**

**Dewê meşka mezine, law**
**Keyayî xelkê jine, law**
**Teşt û biroş tujine, law**
**Zerikek jê da mine, law**
**Gundek bi min re dijmine, law**
**Diglim-naglim dew nabe, law.**

**Dewê bizina hişîne, law**
**Keyaye xelkê narîne, law**
**Rûn ji pîrê dizîne, law**
**Li sêrî çêbûye ûne, law**
**Ne kêl û ne mêzîne, law**
**Diglim-naglim dew nabe, law.**

**Dewo tu dewê biharê, law**
**Dew keya li binê darê, law**
**Şîr pîsê û şîr mirdarê, law**
**Kûçika mastê te xarê, law**
**Diglim-naglim dew nabe, law.**

**(*) Hinek jê re dibêjin: Dewkeyan.**

## MIRÎŞKÊ

**Ax lê dînê mirîşkê**
**Ax lê gidiyê mirîşkê**
**Por sorê por kuvrîşkê**

**Mirîşk hat ser enîşkê**
**Lê xistin bi alteterê**
**Xeber gîşte Anxerê**
**Hindik ma Kemal werê**

**Mirîşk hate heyatê**
**Tene xwarî bi qinyatê**
**Kevir barî li sem-satê**

***  *  ***

**Seriyê tewxê jênakim**
**Çel çêlikî sêwînakim**
**Çel malî xera nakim**

***  *  ***

**Mirîşka me ya zer bû**
**Xo-sabûna me li ser bû**
**Ji toxmê mala koçer bû**

# BARANÊ

**Dê wernê lê baranê**
**Baran barî bi zembîla**
**Zikê erdê kir mîle**
**Xalî li serê ewîla**

**Baran barî bi nameta**
**Zikê erdê kir xeta**

* * *

**Dê werê lê baranê**
**Hat barana Nîsanê**
**Dinya kirî dûzanê**
**Dê wernê lê baranê**

* * *

**Baranê bibar-bibar**
**Delalê bibar-bibar**
**Çûka genimê me xar**
**Sêwîka seriyê hev xar.**

# MIMANÊ

**Mimanê- Mimanê lê, delalê Mimanê**
**Birhê te li zozanê, lê Mimanê Mimanê**
**Guliyê sor badanê, lê Mimanê Mimanê**
**Xwedê biskek bama, lê Mimanê Mimanê**
**Biskên van qumriya, lê Mimanê Mimanê**
**Hûr-hûr biçêriya, lê Mimanê Mimanê**
**Li dora van kaniya, lê Mimanê Mimanê**

**Mimanê-mimanê, lê Mimana Xelîla**
**Çîçeka ewîla, lê Mimanê Mimanê**
**Wer em herin dewata, lê Mimanê Mimanê**
**Bi tedim şabaşa, lê Mimanê Mimanê**
**Bi tedim bertîla, lê Mimanê Mimanê**
**Mimana Xel paşa, lê Mimanê Mimanê**
**Çîçeka nexweşa, lê Mimanê Mimanê**
**Cebeşa nexweşa, lê Mimanê Mimanê**

**Mimanê Mimanê, lê delalê Mimanê**
**Xweska wek van karika, lê Mimanê Mimanê**
**Hûr-hûr biçêriyama, lê Mimanê Mimanê**
**Li dora van merxika, lê Mimanê Mimanê**
**Mimanê Mimanê, lê Mimanê Mimanê.**

# XECO

**Yar xeco mehrûm Xeco**
**Sîngê Xeco bi dereco**
**Rê bi min de herme Xeco**

***  *  ***

**Çi kaniya di koka til da**
**Min kola avê hil da**
**Eslê Xeco ji Aliciya**
**Min tê da keriyê miya**
**Dara reşa li feleka**
**Tê de cîkê ordeka**
**Maşelah li herdu xûşka**

***  *  ***

**Çi kaniya li benda deştê**
**Min kola avka xweş tê**
**Venaxim heta Xec tê**
**Yar Xeco mehrûm Xeco**
**Sîngê Xeco bi dereco.**

# ZEKO

**Ax lê dînê lê Zeko**
**Lê, lê, lê, lê Zeko**
**Zalim dînê lê Zeko**
**Wexta min tolik çinî**
**Di jorî min re sekinî**
**Destê xwe li min hilanî**
**Min xwe ji tirsa re danî**

***          *          ***

**Zeko min dî li benda qabê**
**Zeko siwarbû li qabqabê**
**Eyne dîna ser kabê**
**Çare li dilê min nabe**
**Lê, lê dînê lê Zeko**
**Zalim dînê lê Zeko**
**Dergûşê li min taldiko**
**Di ser xwe re li Xwedê seko**
**Di ser xwe re li ezmana seko**

***          *          ***

**Zeko tu keçika Behdînî**
**Çermî li qerûzê Zînî**
**Bi lêwik re li Mêrdînî**
**Ax lê dînê lê Zeko**
**Zeko keça Mabeta**
**Ket ber çîtê xet-xeta**
**Zalim dînê lê Zeko**
**Min dîlber dî li benda mala**

**Ser serqot pişt hevala**
**Dara reşa li feleka**
**Têda pînka ordeka**
**Maşela li herdu xaka**
**Kêlek dane kêleka**
**Guneh li ustûyê biraka**

***　　　　*　　　　***

**Îşev berfê bariye**
**Li ser memkê difariye**
**Bi heft qutiyê bodreliye**
**Çavê kêla heliye**

***　　　　*　　　　***

**Germa havînê tîn da**
**Şewta havînê tîn da**
**Di hewşa Zekoya narîn da**
**Aman, aman lê Zeko**
**Te canê min bir lê Zeko**
**Pişkoka ji sîng veko.**

# LOQ LOQ

**Loq, loq, loq canê, ha**
**Netê husa legenê, ha**
**Roka îda qurbanê, ha**
**Ser hesarê bi nan tirşikê, ha**
**Eyşo li wir fişke-fişke, ha**
**Mirîşk hatin tu kişke, ha**
**Kundir hûrke tu bi tirşke, ha**

**Loq, loq, loq canê, ha**
**Tûrik daket Yazbaxê, ha**
**Eyşo çû ser xemazê, ha**
**Dig-dig Eyşo dixwazê, ha**

**Loq, loq, loq canê, ha**
**Netê husa legenê, ha**
**Roka îda qurbanê, ha.**

# ÇEÇANÊ

**Ax lê yiman Çeçanê, dex lê yiman Çeçanê**
**Çeçanê di got nizanim, delalê digot nizanim**

**Lêv şêrînê bi şerbetê, dilê min bi te ketê**
**Min tu dîbû li ser bîrê, av kişandî bi zincîrê**
**Zicîr qetî ket bîrê**

**Yaman, yaman Çeçanê**
**Her, here Çeçanê**
**Were,were Çeçanê.**

# LEYLANÊ

**Lêwik yanda bi Şam da**
**Xwe ji Leylê re bi kutan da**

**Leylê, Leylê, Leylanê**
**Roja Eyda qurbanê**

**Lêwik yanda bi yanda**
**Xwe ji Leylê re bi beran da**

**Lêwik yan da bi Heleb da**
**Xwe ji Leylê re bi şeb da**

**Lêwik yanda bi Mêrdîn da**
**Xwe ji Leylê re bi Ebas da**

**Lêwik yan da bi Wan da**
**Xwe ji Leylê re bi derman da.**

# KEWRAN

**Kerwan hat kerwan, lê**
**Hat kewranê zebeşa, lê**
**Danî li taxa çav reşa, lê**
**Hêwirî li serê hewşa, lê**
**Bav ridayê nadê min, lê**

***  *  ***

**Hat kewranê Erdûşê, lê**
**Hêwirî li deşta Mûşê, lê**
**Dikim ez herim pîşê, lê**
**Te ez helandim, şewitandim, lê**
**Kirim darê derkûşê, lê**

***  *  ***

**Hat kerwanê Mêrdînê, lê**
**Hêwirî li Mêrsînê, lê**
**Ez helandim, şewitandim, lê**
**Kirim qulpê mertînê, lê**

***  *  ***

**Hat kerwanê Kerkerê, lê**
**Hêwirî li bêderê, lê**
**Ez helandim, şewitandim, lê**
**Ez kirim qulpê kemberê, lê**

*                    *                    *

**Kewrane hat kewrane, lê**
**Hat kewranê hêrûka, lê**
**Danîbû li taxa bûka, lê**
**Hêwirî li ber gedûka, lê**
**Ez helandim, şewitandim, lê**
**Ez kirim şûra nênûka, lê**
**Bav rindayê nadê min, lê**
**Kewrane hat kewrane.**

# CONTA TURK

**Ew eskerek rabû law, ji hêla Diyarbekir**
**Daket Erzeromê law, xan û qişile qîm nekir**
**Çû deşta Siwêrekê cebakî herbê vekir**
**Qumandar xayînbûn law, li lawê bava senekir**

***　　　*　　　***

**Bejina Erif efendî law, ji letê telayî bûberê**
**Destî li ser qevza şûre digerê li hewliya şere**
**Surgunêd Ermeniya rakir ji hemo dera**
**Dewrane, dewrane law dewrane reş dewrane**
**Ji qumandarên conta Tirkan law herbeka îlane**

***　　　*　　　***

**Kal û pîrêd Ermeniya pergende law, li orta mane**
**Keç û xortêd Ermeniya pergrndene law, li orta mane**
**Temriyê wan ên li dûzan li qir û qalan geriyane**
**Dibên lêxin, lêxin, lêxin ji me re Cinet erzane.**

# WEY LAWO

**Wey law, wey law, we lawo, law wey law, wey lawo**
**Li serkê xênî di xew dawo, law li ser xênî di xew dawo**
**Min panek pê ve dawo, law min panek pê ve dawo**

**Ne tu bî ne xençer bê, law ne tu bî ne xencer bê**
**Xençer gurzek cewher bê, law xençer gurzek cewher bê**
**Di ser dilê te wer bê, law di ser dilê te wer bê**
**Eş hekîma li ser bê, law Eş hekîma li ser bê**
**Fata Gewra li hember bê, law Fata Gewra li hember bê**
**Wey law, wey law, wey lawo, law wey law, wey law, wey lawo.**
**Şêrînê Xwedê dawo, law Şêrînê Xwedê dawo**

**Law şivanê pezê yaz, law şivanê pezê yaz**
**Ez hef sala şuxulîm , law danzdeh meha yêmek da**
**Min nekir bihayê xizêma poz.**
**Wey law, wey law, wela lawo, law wey law, wey law, wela lawo**

**Law şivanê bizina, law kur şivanê bizina**
**Bizin berdan kizina, law bizin berdan kizina**
**Ez heft sala şuxulîm, law danzde meha yêmek de**
**Min nekir bihayê bazina**
**Wey law, wey law, wey lawo, law wey law, wey law, wey lawo**

**Law şivanê karika, law kur şivanê karika**
**Karik bedan darika, law karik berdan darika**
**Ez heft sala şuxulîm, law danzdeh meha yêmek da**
**Min nekir heqê morika**

**Wey law, wey law, wey lawo, law wey law, wey law, wey lawo**

**Çûm Helebê carek, law çûm Wêranê carek**
**Min anî hene baerk, law min anî hene barik**
**Malê bi bûk leganek, law malê bi qîz qentarek**
**Wey law, wey law, wey lawo, law wey law, wey law, wey lawo.**

# AŞ

**Aş digerî dor bi dor**
**Wer keremke were jor**
**Bi te re bikim çiftek şor**
**Ramûsankê bi min de,  ji bin biska, ji guliyêd mor**

***　　　*　　　***

**Aş digerî xume-xume**
**Dihêra garis û genime**
**Wer kermke wer cem mine**
**Ramûsankê bi min de ji bin biska, ji xum-xume.**

***　　　*　　　***

**Aş digerî û dihêra**
**Wer keremke wer vira**
**Ramûsankê bi min de ji bin gerdenê zêra.**

# MILAWÎ

**Milawî, milawî law qurbano, milawî
Milawî, milawî law heyrano, milawî
Siwarê hespê seklawî, milawî
Ez kuştim vê lawî, Milawî
Destmala xet beleke qurbano, Milawî
Min vekir bê heneke heyrano, Milawî
Dinya çerx û feleke qurbano, Milawî
Destmalek kesk û şîne heyrano, Milawî
Min vekir tişt tê nîne qurbano, Milawî
Çi dinyak derwîne heyrano, Milawî
Lawik tê aşê Darê qurbano, Milawî
Xulamê Reşê Şorê heyrano, Milawî
Milawî-Milawî law heyrano, Milawî
Milawî-Milawî, law heyrano, Milawî.**

# TOZ LI BANA

**Toz li bana, li bana**
**Dê bi heyrana, li bana**
**Qetya benê mircana**
**Xemla tenê bi xwedana**

***     *     ***

**Toz li bana Robarî**
**Dê bi heyran Robarî**
**Qetiya zêr û mecarî**
**Tenak firiya vî warî**
**Tenak firiya wî warî**
**Şêrînê bi dost û yarî**

**Toz li bana Şêrewî**
**Tu bêriyî û bedewî**
**Xezala çav li xewî**
**Toz li bana, li bana**

**Toz li bana Şikakî**
**Dê bi heyrana Şikakî**
**Kofiya xwe ji bayê kakî**
**Derê tê li her awakî**

***     *     ***

**Toz li bana Amika**
**Dê bi heyrana Amika**
**Qetiya beniyê morika**

**Toz li bana Xwestiya**
**Qetiya beniyê xweziya**
**Tenak firiya ser çiya**
**Xemla tenê bi xwediya**
**Toz li bana, li bana**
**Dê bi heyrana li bana.**

# FIRÎNGÊ

**Her lê lê, Firîng lê lê**
**Were lê lê, Firîng lê lê**
**Kuva herim ji dest te tolê**
**Bûk dirsaqê li nav êlê**
**Avka reşa wek dengizê**
**Li ber diçandin çeltîk-rizê**
**Ber vê dane berx û pezê**
**Li şûnê mayî nêriyê xezê**

***　　　　*　　　　***

**Neyî şivanim pêz bi çêxim**
**Neyî gavanim ga bi deştêxim**
**Neyî axame li êlêxim**
**Neyî mudûrim li têlê xim**
**Neyî xoceme te ji rê bêxim**
**Here lê lê, Firîng lê lê**
**Were lê lê, firîng lê lê.**

## KOÇERÊ

**Sîme sîme koçerê sîme, lê**
**Li ser kanîka dor bi bîme, lê**
**Xulxul tê, dor bi çîme, lê**
**Ji derdê te re lê, ez ramedîme**
**Nêyî bawiyo lê, neyî tawîme**
**Li benda guliyê teyî zerîme**
**Sîme sîme koçerê sîme, lê.**

* * *

**Yaylê Kurda lê, çiqas xweşin**
**Çem û kanîk lê, jê dimeşin**
**Deşt û newal lê, bi gul-binefşin**
**Ji derdê te re lê, kabên min gevşin**
**Ji eşqa te re lê, ez rawestîme.**

* * *

**Sîme lê sîme yarê, lê**
**Govend geriya lê, li binê darê**
**Wer ser pêşiyê lê, şêrîn yarê**
**Bihejîn lê, guçilê şarê**
**Wey koçerê lê, min dil xwerê**
**Ji eşqa te re lê, sewdalîme.**

* * *

**Koça barkir lê, bi rêketin**
**Siwar-peya lê, bi nav ketin**
**Ez û teva lê, ji hev bi dûr ketin**

**Dil-cîgerê min lê, ar vê ketin**
**Tu koçere lê, ez gundîme**
**Sîme sîme koçerê sîme, lê.**

# PARSÊ

**Çale, çale çalecîme**
**Me bi rêkin em rêwîne**
**Çale, çale ji wê de têne**
**Di defka xwe de em distirêne**
**Me bi rêkin em yalantaqin**

***          *          ***

**Em koklîne bi ûcaqin**
**Bi bîraqin bi sencaqin**
**Fiqarene em yalantaqin**

***          *          ***

**Sein bulxur bîr îsterim**
**Beyrem gune aşiya perim**
**Hey lê, hey lê xatûn bacê**
**Hewşî ûzerim daraxacê.**

# ÇERKEZÊ

**Ax lê dînê Çerkezê, lê**
**Çiqas bi eşq û lezê, lê**
**Ji mala derket dibezê, lê**
**Te li hêvara min li sibê, lê**
**Li ber pencerê xûyan dibê, lê**
**Her ku çavên min lê dikevê, lê**
**Kezeba min dişewtê, lê cîgerê min hûnik dibê.**

***    *    ***

**Min sed mektûb ji tr re şand, lê**
**Te jî zerfa ser dirand, lê**
**Qorik du-du te lê xwand**
**Ismeîl bi hewşê ket, lê**
**Çîrinî li mektûbê ket, lê**
**Hêrinî bi hespê şê ket, lê**
**Tirk li dilê Eyşê ket, lê**

***    *    ***

**Min cot ajot li eniyê, lê**
**Te îşaret da min bi eynê, lê**
**Sozê dide sonxiyê nînê, lê**
**Min lawikî dihelînê, lê**
**Ax lê dînê Çerkezê.**

## URFÊ

**Lê, lê, lê, lê Urfê**
**Fîstan li bejnê ducurfê**
**Min bi dengekî ban te kir**
**Tu ker bû te hus nekir**
**Tenbûrek min bi dest xwe kir**
**Bi şînge-pînga temûrê**
**Min xelkê şêrîn ji xew rakir**
**Çû û hat, xwe li bakir**
**Eşqa dilê min rakir**

***   *   ***

**Lê Urfê, lê Urfiyê**
**Min dîbû li ser kaniyê**
**Li bin dara biyê**
**Biyê berda rêşiyê**
**Delalê medeniyê**
**Ay lê, lê Urfê.**

# NARÊ

**Narê, narê tey narê, narê**
**Narê, narê wey narê, narê**
**Ava kunê kevnarê, narê**
**Kun daye siya darê, narê**
**Navê nara min Nîse, narê**
**Kember li navê dibrûse, narê**
**Li sêrî şala rîse, narê**
**Di bin re porê sîse, narê**
**Narê, narê tey narê, narê**
**Narê, narê wey narê, narê**

***    *    ***

**Narê, bulxur kelandî, narê**
**Li pişta xênî reşandî, narê**
**Narê bilbila vepeçandî, narê**
**Narê şivik hezandî, narê**
**Ustû li teva firandî**

***    *    ***

**Nara min çû ber avê, narê**
**Por berda heya navê, narê**
**Kel-şî şuştin bi aravê, narê**

***    *    ***

**Narê biska xwe şekir, narê**
**Sor-qutnî li bejna xwe kir, narê**
**Serê dîlanê xweş kir, narê**
**Serê govendê xweş kir, narê.**

# HINARÊ

**Anê hinarî şêrîne**
**Dayê hinarî şêrîne**
**Hinar hinara Cindirêsê**
**Hinar dizîn kirin kêsê**

**Hinar hinara Maratê**
**Hinar dizîn kirin latê**
**Hinar bu qismetê Fatê**

**Hinar hinara Mabeta**
**Hinar dizîn kirin xeta**
**Hinar bû qismetê çeta**

**Hinar hinara Basûtê**
**Anê hinara şêrîne**
**Dayê hinara şêrîne.**

# XATÛNÊ

**Tew lê, tew lê xatûnê**
**Li min dixê bi qurşînê**
**Ez gêjkirim bi hilm û bînê**

**Xatûnê pêlik li bakir**
**Delalê pêlik li bakir**
**Qafê ewîla rakir**
**Eşqa dilê min şakir**

**Tew lê, tew lê xatûnê**
**Hat xatûna bajarî**
**Hat delala bajarî**
**Tu şêrîna bi dost û yarî**
**Tew lê, tew lê xatûnê.**

# CANÊ

**Wey canê canê canê, lê cana min**
**Bilbila di kûna gir de, lê cana min**
**Wey virda virda virda, lê cana min**
**Te ez helandim-şewtandim, lê cana min**
**Sebra min nayê di hundir de, lê cana min**
**Ez bûme kewê di serê gir de, lê cana min**

# ŞEFO

**Çûm Cizîrê lê, lê
Cizîr dûre wau-way
Şefo dîbû zalimê li ber Xêbûre
Li bejnê min nedî tu qusûre
Arê eşqê bi kuzûre**

**Çûm cizîrê lê, lê
Fît û fere way-way
Min cot ajot lê, lê
Li erdê gewre way-way
Min xet lêxit zalimê
Ser bi sere way-way
Min piş xwe nerî lê, lê
Xeta min xare way-way**

**Çûme Şamê lê, lê
Zalimê çiloyî pêve way-way
Min kir kakile zalimê
Da ser lêva way-way**

**Min Şefo dîbû law bira
Ay bi rêva way-way
Ezkê pêşkim law bira
Ser ji nuva way-way
Tu bi wî kirasî çû kinca**

**Min Şefo dîbû li serê zinca
Min dest avêt şêrînê, nav qulunca
Di dest min de dide finca.**

# MEYREMÊ

**Hal meyro meyremê**
**Bes delalê Meyremê**
**Soz berda li piş kelemê**
**Qîza şahî Ecemê**
**Destmalek çar qelemê**
**Bûka roja çarşemê**
**Ket êvara pêcşemê**
**Ji êvar de holbûm cemê**

**Hol meyrema Şikakî**
**Bes delala Şikakî**
**Kofiya xwe ji bayê kakî**
**Derê-tê li her awakî**
**Dil ketî mantorakî**
**Hal meyrema têl hesî**
**Ji mala derket dibezî**

**Çûme mala Meyremê**
**Bavê Meyro Meyremê**
**Bes delalê Meyremê.**

# DOTMAM

**Çûm ser kaniya Alkana, pismam law**
**Sewda bi ser min de dana, pismam law**
**Keç hatî ji gundê hana, pismam law**
**Bi dest de qufa bacana, pismam law**
**Bi min dada marê tofana, pismam law**

**Ez nakim-nakim, nakim, dotmam lê**
**Li rindê xelkê senakim, dotmam lê**
**Eşqa dila ji bîr nakim, dotmam lê.**

# GOTINÊN PÊŞIYAN

**A:**

- **Ar di kutikî kevin de ye.**
- **Av neherime zelal nabe.**
- **Avê bin kayê ye.**
- **Aqilê sivik, barê giran.**
- **Anî ji deriya, da xêra miriya.**
- **Aşvan ti carî nabe poşman.**
- **Agirê dosta meriv naşewtîne.**
- **Aqil taca zêrîne, serê hemû kesî de nîne, dûrê xatirê lawîne.**
- **Agir gula zivistanêye.**
- **Aş çû li çeqçeqê dipirse**
- **Avê ku kir hum–hum jê netirse, ji yê meyî bi tirs.**
- **Avê bin kayê ye.**
- **Axayê bê xulam.**
- **Aqil ne ji çûk–meziniyêye.**
- **Av ku pir di gola de bimîne, digere.**
- **Agir û pûşe li cem hev nabin, agir û benzîn li cem hev nabin.**
- **Ax çiqwas pire, mar bi qinyat duxe.**
- **Ahe-kirinek naxirê komdike û yek bi revandin dide.**
- **Axayê me bû mixtrar, pişta me bû zinar.**
- **Axa bû ker cilkê xwe çemek ser.**
- **Ava çûkan, xwerina mezinan.**
- **Apê Heso xwe bi xwe bi di peso (dipesine).**
- **Alafa batofkê ye.**
- **Aşê Hesenî Seydo ye.**
- **Aş bajarekî di malê daye.**
- **Av lê venexar.**
- **Aqil di qufa daye, lê di sala daye?.**

**<u>B:</u>**

- **Bûk bê zimane, xwesî bê ûjdane.**
- **Bûye gola req û beqa.**
- **Birînên ruman bi ava gula nayên kewandin.**
- **Bû sûnda şivana.**
- **Bû doşeka Meydana.**
- **Bû heyva Eyê.**
- **Bi paça zikî xwe mezin dikin.**
- **Ben ne bi lingan ketî û ne jî bi serî.**
- **Biroş digere qapaqê dibîne.**
- **Benîştê dîna ji lîtirêye.**
- **Bila şêr be çi jin be, çi mêr be.**
- **Bêderê vê tene li ba meke.**
- **Bawer nekir mêr bike, mêr kir mal-heyştekê dewîdike.**
- **Berxî nêr ji kêrê re ye.**
- **Bocî ku tu bi zorê bi şîne awê, wê çi awê ji te re bike.**
- **Bûka li ser hespê kes nizane qismetê kê.**
- **Biroşê got binî min zîve, eskê got ezî ji wir têm.**
- **Belaş karbik û boş rûmene.**
- **Berfa avdarê nema heya êvarê.**
- **Birîna li hevala qula li kendala.**
- **Bi gura re duxe û bi şivana re şîn digre.**
- **Bi nermî mar ji qulan derdikevin (dertên).**
- **Berfê buxe ji tîna bi mir, daniya buxe ji nêza bi mir.**
- **Bizna kol elimî daniya**
- **Bûye wek çawîrê ku kevir ji ser hilatî.**
- **Bûye wek sedanî li piş xwedanî xwe nîştî.**
- **Bûka pîr û pal, şivanê dar û kopal.**
- **Bihar hat, rûmeta kincên zivistanê hilhat.**
- **Barê qaqila, pişta kêm aqila.**
- **Bextê qîzê ji feala dê, bextê dê cihêzê qîzê.**
- **Bejin biriqî, dil xeriqî.**

- **Berê darê, darê dixemlîne.**
- **Beza hespan namûsa siwaran.**
- **Bi çêra guran bibe, gur hazir dibin.**
- **Bîna dê ji xaltîkê tê.**
- **Bêje rast, raze rast.**
- **Bi dilê kalan qîzê bistîn, bi dilê xortan hespê.**
- **Buxe mîna mêra, rabe mîna şêra.**
- **Bilind firî alçaq ketî.**
- **Birûyê min şedikî, çavê min derdikî.**
- **Bûk tine zar-ziman, xwasî tine dîn-îman.**
- **Berê darê bi darê ve kurmî dibe.**
- **Birîn birîna teze dike.**
- **Barî ketî, ji xeynî xwedên, kes ranake.**
- **Bextê mêra ji mêra naçe.**
- **Berx li berên tê.**
- **Bê hêvan şîr qeymaq nager.**
- **Bi gur re gotin: Çima ustî te qalinde, got: Ez bi destî xwe dikim û bi devî xwe dixum.**
- **Bi kevçî komkir bi heskê belakir.**
- **Bi pirsê meriv diçe Qudsê.**
- **Bila hindik be bila rindik be.**
- **Bila  ruwê mirov bi êşe û dil ne êşe.**
- **Bira biratiye, bazaar beyantiye.**
- **Bila dilî bi dil de be, bila tûrê parsê li mil be, qonaka nêzgîk ji vir heya bi Bexdê be, balîvê min kevir be, doşeka min erdbe, nivîna min ezman be.**
- **Birçîbûn ne birayê her kesiye.**
- **Birçîbûn kirasekî ji êgire.**
- **Bizna nehletî dev lêketî.**
- **Bê zurne direqisî.**
- **Ber şerî sibê here û ber xêrê êvarê mere.**
- **Bi kêvcal re gotin: çima tu yan xar-yan xar dimeşî, got: ewîlqa bi reşiye.**
- **Bi şev li te dinin  û te dibezînin.**
- **Bûk di çoxî sorik  de, qiçik [zaro] di gûyî zerik de.**
- **Beza bisûnê heya qulûnê, beza pisîkê heya qulîkê.**
- **Bû kundir û ustû xarkir.**

- **Buxe bi qinyet, bizewic ji mala kok û binyat.**
- **Bi nav linga xist.**
- **Bibe mişk, paşê tûrê xelkê qulike.**
- **Bavê xwe ne dîtiba wê bigota ez lawê kême.**
- **Bi rovî re gotin: Emkê te bikin padişê mirîşka dagirî û got: Ezî xwesim.**
- **Berî qatirê bikire, êfir digre.**
- **Bi zembîla hatî xar.**
- **Bizina kol elimî daniya.**
- **Bû kuriyê bûtê.**
- **Bi kerê nikane, dibeze kurtên.**
- **Bira ji birê hezkira, jinê birê nedibir.**
- **Bû noka li zinêr ketî her perçak bi derekê de çû.**
- **Bi fenê dibe binê benê.**
- **Bona xatira çû ser dînê gawira.**
- **Buhar bi gulekê nayê, lê gul nîşana buharêye.**
- **Barî girane, mezelî wêrane.**
- **Bulxur kişî bi legena, tişt neket nav dirana.**
- **Bizinê ku bi dizî werê nêrî, dê aşkere bizê.**
- **Bû gundê Husê.**
- **Bîna fisa xwe kirî.**
- **Bilbil li hemberê naxwîne heya buhar neyê.**
- **Bi kumî bavî xwe dikene.**
- **Bi meva bû şima.**
- **Bûye benîşt û li destî me hatiye alandin.**
- **Beza pisûnê heya kadînê.**
- **Bi tirê xwe re dibê wîcee.**
- **Boş nabe ku serî xwe buxrîne.**
- **Benê (werîsê) kevzêye.**
- **Ba bi bin kum ket.**
- **Barî kerê helaw be an jî top û tiving be dîsa gurê buxe.**
- **Bi seriyê min hat, lê bi yê bavê min.**
- **Bû roviyê ku, min ji mirîşkên xwe re mezinkirî.**
- **Bizin bi bizintiyê xwe, ku dimexelê şûna xwe vedide.**
- **Bi dû kunda kev mera di qunca wer dibe.**
- **Bi kulemista derê dirêşê.**
- **Ben ne bi linga ketî, ne bi sêrî.**

- **Bi dîna delava yoqle dike.**
- **Bû kirtîna gêzer.**
- **Bila heba, bila komek hestî ba.**
- **Bûne bizinê Xeîlê Eşê.**
- **Bû nimêja Weqês.**
- **Bûne ar-pûşe li serî hevdu.**
- **Bûye istiriyê kerngê, sivik derê û li paş xwe nanire, dûr-dûr dere.**
- **Bû şorba malê Hebî Hemokê, xwe li ser serî berdê tu nabînî tenak nîsk û nokê.**
- **Bila dilî bi dil be, bila doşekê me ra kevir be, balkî ber serî me ra fişkul be û orxanê ser me ra bi dew-du ciya qulbe.**
- **Bila kûnê yekî derkeve û navî me ra der nekeve.**
- **Bila zik têr, bila ji dêr be.**
- **Bila di zikî me ra de be û ne di diyê me ra de be.**
- **Bûne qiçkên Berbnê.**

<u>**C:**</u>

- **Cilê xwe ji avê derdixe.**
- **Ciyê ku agir lê nîştî dişewite.**
- **Cîranî xerap mera xwedan tişt dike.**
- **Caw bi tir_ fisa boyax nabe.**
- **Caw li cilho tim hesrete.**
- **Cîranê nêzîk ji biray dûr çêtre.**
- **Cih ji dila tenge.**
- **Cihê ku maşe lê hebe, destî xwe meşewtîne.**
- **Cada (zukakan) dipîve.**

## Ç:

- **Çûkê kura be û ne çûkê bira be.**
- **Çûkek di dest de çêtirî dehan li ser darê.**
- **Çû seferê hat kerê berê.**
- **Çiya çiqas bilindin rê pê dikevin.**
- **Çû nêrî bîne, hat ku bizin zayî û dema ku li pizanê şimitî got:neile li karî bi lez were.**
- **Çiyayên bilind serî bi dûmanin.**
- **Çi bi etêra hebe wî difroşe.**
- **Çîrokên pîrê li dilê te nayên.**
- **Çawa bi te re gavike yek bi zirarêye.**
- **Çiyas rastî çiya nayên, lê hatin ne bi destê dêye.**
- **Çawîr bû bost, dijmin nebû dost.**
- **Çandinê cebeşa (zebeşan) bona nexweşa.**
- **Çû cebeşa ji bona nexweşa.**
- **Çav melûl, rê dûr nabire.**
- **Çûndin di dest mirov daye, lê hatin ne bi dest daye.**
- **Çiyayên bilind bê ba nabin.**
- **Çiqas dar bilind bibe serî naghîne ezmanan.**
- **Çiqas zêr buhaye li ciyê xwe ye.**
- **Çar yar li awekî nabin.**
- **Çakûçê osteyan zêre.**
- **Çerm di derê tenik de qul dibe.**
- **Çûm mala dewrêşa, dan ber min mastê gamêşa.**
- **Çav dibîne, dil dihebîne.**
- **Çiya bi çiya nakeve, lê çav bi çava dikeve.**
- **Çû ji ber çava, dûrket ji dila.**
- **Çi sar_germiyê min ji te heye.**
- **Çirtan (lêrî) ji şujiyê ye.**
- **Çi diçîne, tê bibîne.**

**D:**

- **Di dû xorta re jîn yek boşe.**
- **Demên ku te pişt xarkir, yên kevira bi serkin pirin.**
- **Dev dibê guh nabîse.**
- **Dev ji dêv namîne.**
- **Di hesîra kayê werdan.**
- **Du zebeş bi destekî ranabin.**
- **Dîkî çê di hêlînê (hêkê) de bangil dide.**
- **Destek bi tenê li çepika nade.**
- **Destê bi xêr li ser zikê têr.**
- **Dar di bin xwe de birî.**
- **Dîkê rojekê be û ne mirîşka salêkê be.**
- **Dînê ku bigrî çêdibe, lê yê ku bikene çênabe.**
- **Diranî çirûk di pelûlê de dişke.**
- **Derê (deverê) ku mihî lê tinebin, ji bizina re dibêjin Ebdil kerîm axa.**
- **Du seriyên berana di biroşkê de nakelin.**
- **Dilê tirsok sîngê gewr nabîne.**
- **Dengê defê (daholê) ji dûr ve xweşe.**
- **Derziyê hevala xîyan tê, lê direşê ber çavan nabîne.**
- **Dar bi berî xwe şêrîne.**
- **Destê reit li ser zikê peit.**
- **Def jî ya wane û gopal jî.**
- **Destî ku te nikarî gezkira tu yê maçkî.**
- **Dê û dota girte hev (şekir) kêm _ aqila înankir.**
- **Dêkê (diyê) diza du tira dike, yek ji şabûneka re û ya din jî ji tirsa re.**
- **Dest ku rabe ne kêl û mîzîne.**
- **Dînê ku dîndoq diyeye.**
- **Dest di ser desta re hene heya mala Xweda.**
- **Du kêf li awakî nabin.**
- **Dînê tazî nase, tu dînê bi kinc (cil ) nasbike.**

- **Dûr here durust vegere.**
- **Dîtim ezim, nedîtim dizim.**
- **Dest desta dişan, diftilin çava dişan.**
- **Dayê buikê jinê ruhukê.**
- **Defa li ber keran, çira li ber kûran.**
- **Deng ê ezmana, nîşana barana.**
- **Derewîn carekê duxe firavîn.**
- **Di dewsa şêra, kund dike sêra.**
- **Dewê payîzê, bide ezîzê. Dewê buharan, bide neyaran.**
- **Dêw û dota şerkirn, kêm aqila bawer kirin.**
- **Dinya bi şêwre, lê bi aqilê xwe bike.**
- **Diranê derman kêş.**
- **Derdvêketî pirin, lê ne li cem hevin.**
- **Derdvêketî derdvêketiya nasdikin.**
- **Derd, derda winda dike.**
- **Derdê sêwiya girane, xiyale birçiyê-nane.**
- **Dil kal nabe.**
- **Dar bi verotinê, mirov bi gotinê.**
- **Darê bilnd nizim nabe.**
- **Daro şikesto, xaro besto.**
- **Dewran tim bi dorin; geh li jorin, geh li jêrin.**
- **Dêndara xwe avêtî pişta xwîndara.**
- **Deynekarim zêrê zerim.**
- **Deyn li te kir, çav li xwe kir.**
- **Degê daholê dike, mala dewatê nasnake.**
- **Dest-siwar li siwar dipirse.**
- **Deve û gêre (gêrik)!.**
- **Devera sol dikirin jîjû got: Pepê min jî.**
- **Destê merda, deranê derda.**
- **Dîwaro eyb û qusûr sitaro.**
- **Devê xar ken lê nabe sitar.**
- **Dew xwestin kodik veşartin.**
- **Devî zû dibe dar, xalî li seriyê merivê bê war.**
- **Dîndarbim bi mal darbim.**
- **Diyarî qespe, şûndiyarî hespe.**
- **Dinya deme, hemû kul û xeme.**
- **Dinya derwîne ji kesî re namîne.**

- **Dinya ne behs û bazare, dinya soz û qirare.**
- **Du mişk bi hev re, ji qulekê derketin, yekî gote yê din: tu ji ku hatî.**
- **Dûvê kûçik (seg) heft sala kirin qêlib, derxistin ku firkek lê zêde bûye.**
- **Dewta mîra girberbû feqîra.**
- **Diravê sipî bo rojê reş.**
- **Di şûna şêra de dixwîne pepûk û kunde.**
- **Dilîzim _ dilîzim, nalîzim _ nalîzim.**
- **Dizî encûra payîzê bêlî (xûya) dike.**
- **Di kuda zirave bila di wir de biqetê.**
- **Dev bi şîr şewtî pûfî dêwkir.**
- **Dîlan çawa digere tu jî wilo digerî.**
- **Dêkê (dayîkê) mera tim lawa nîne.**
- **Dûre bi nûre.**
- **Demek a gula yek a sosine.**
- **Dema yekîtî peydabû milet pêşve çû.**
- **Diya te îro li binê kelêbû, kê got: diya min. Eger ku diya te çêye ew çi karî, li wê derê, dike.**
- **Destê xwe mavê (ne- avêj) her qultarekê, hinek jê mar-dûpişk tê de hene.**
- **Dilî xasûwê nekeve zêve qîzê nadeyê.**
- **Dayîkê xelkê nabin ên me ra.**
- **Darê bê ber bê xêr.**
- **Diya te tu rojeke înê aniye.**
- **Dinê, nedinya dinê dît ji eşqa re bi xwe de rît.**
- **Dil kevroşko.**
- **Dilê xwe kete sergînekê heft sala bi xwe re gerand.**
- **Dest negîştê got: bila xêra dê û bavê be.**
- **Def jî pê ma, gopal jî.**
- **Deq bi duqê.**
- **Dûvê mişk li malê bi ard nabe.**
- **Dostanî germa – germa, dijimanî nerma – nerma.**
- **Demê ker bikeve, ji xwediya mêrtir tikes tineye.**
- **Demê piştê te bixure ji tiliyên te xortir tinene.**
- **Derda ji dervêketiya bi pirs.**
- **Deng ke ( bi-axif ) tu dicerisî, deng-meke tu dikerisî.**

- **Dar dikeve, ber kuda.**
- **Derî kilîto, nav gund cirîto.**

## E:

- **Em bûn tûrek ka.**
- **Em bûn benîştê mezekê û ketin devê xelkê.**
- **Ez dibêjim rêyê hava, ew dibê hurçî hava.**
- **Em bi hevra li dora til digerin.**
- **Em bi ebe gewra (ebe boza) razî nebûn û ebe sor jî bi me razî nebûn.**
- **Ereb û tembûr, hurç û bilûr.**
- **Ezî di nav bêndera (koma) dîna de me.**
- **Em hejê gedûkê ne.**
- **Em şandin diziyê û di pirşa dan firîziyê.**
- **Em dibên em ne mêrin, dibên çend zarokên te hene.**
- **Ev jî dohnkê ji axêye.**
- **Eger tu qatirên kewranê ( bazirciya) netirsîne, tu tiştî li wê dinê nabînî.**
- **Eger tu li nav tirba xew nekî tu yê xewnên bi tirs nebîne.**
- **Ew li baniya wek hevin.**
- **Ez bi te, tu bi min, em herdu bi Xwedê.**
- **Erzan kirî heban dirî.**
- **Ez axa, tu axa, kî golika bibe nav baxa.**
- **Ez mêr, tu mêr, kiye ji me yê şêr.**
- **Ez wa bikim bav bimre, ez wa bikim dê bimre.**
- **Eger ku mêjî hebe ezê bimrim.**
- **Em şîlta tevîhevkin.**
- **Ewrê gir-gir, baran jê nayê.**
- **Etar ji barî xwe naxe.**
- **Eger derse, herfek bese.**
- **Eger ne kewînê ne xwêye.**
- **Ev kenî ro nîvroye.**
- **Eger ku dilî şivên bixweze, dê têlme ji nêrî bidoşe.**

- **Eger ku dudiya bi tere got komî te ne li seriyê teye, carekê destê xwe bavêjêyê.**
- **Eger ku, masî ji dest te filitî nede dû.**
- **Ewê te tihî bibe ser kaniyê (avê) û te tihî vegerîne.**
- **Ezê te tihî bibim ser avê û bînim û tu nizanî vexwe.**

## Ê:

- **Êkê arvanî min ji êş çeke?.**
- **Êgir li ser piştê vêxîn li xwe nane.**
- **Êma-amkî her demê li awkî.**
- **Ê pê zanî awa xwe hilanî.**
- **Ên destên me ra bikin, dê û bavê me ra nakin.**
- **Ê xwest rûkî reşe, ê neda herdu rû reşin.**
- **Ezet ji kera ra nabin.**
- **Ebelimil giş mêr bana, ser- sipî giş jin bana dinêyê xera biba.**
- **Ên nuh hatin ên kevin xelatin.**
- **Ê bi gû bi yê herî kenî.**
- **Ê mar pê dadayî xewkir û yê bircî xewnekir.**
- **Ê berdayî berda û li yê girêdayî da.**
- **Ê ne di şer de, şer pê sivike.**
- **Ê mera xera bibe diranî mera di pelûlê de dişke.**
- **Ê xwe di zikî gur de nêle (nahêle).**
- **Ê kin xweşe.**
- **Ên wek te bi malin, bi qiçik û jinin.**

# <u>F:</u>

- **Fincek bi canî yek bi pîrî.**
- **Fîstan, bi perispana (pîna) nuh nabe.**
- **Fira kewêye.**
- **Fêdê kêçê li dengizê dibe.**

## G:

- **Gur cermî xwe çenake.**
- **Geliyên kûr bê av nabin.**
- **Gulek bi tenê biharê çênake, lê gul nîşana buharêye.**
- **Gayî kûr li şûnê naxirê dimîne.**
- **Ger axa bû ker cilkê xwe çemeke ser.**
- **Geya li ser kokê xwe şîndide.**
- **Gur be;bila gur te nexin.**
- **Ger ne ji fesadan be, gur û miyan dê bi hev re biçêrin.**
- **Ger ker heşimîn ji hespa bezotir dibin.**
- **Ger dilî şivên bixweze, dê ji nêrî têlme çêbike.**
- **Ger av di golan de bimîne, dê bigemire.**
- **Gayî dîn tim golike.**
- **Ger dev ne devê teye, çima tu dengdikî.**
- **Ger mirinê nebîne bi tayê razî nabe.**
- **Ger bi xewê ba , kêsû dê mal bikra.**
- **Ger rovî xema baranê bixara, dê kulkekî xwe çêkira.**
- **Ger ku ga bikeve kêr li ser pir dibin.**
- **Gulane dew cem hemiyane.**
- **Gur hate diyara, wey li sêfîl u jara.**
- **Gurê mêşe hîn-nabe pêse.**
- **Got: Xweş xebere, belê min jê ne bawere.**
- **Gul li gulê dinire, dipişkive.**
- **Gur bi du pariya namire.**
- **Gur û hurç bûn destbira, dinya bû medî zeman.**
- **Germe cil şerme, sare cil yare.**
- **Gelî bê deng nabin, çiya bê ba nabin, mirov bê yar nabin.**
- **Gû jî ji gênime.**
- **Gotina te bi şêkir dibirim.**
- **Ger gur pîr bibe dibe pêkenîna segan.**
- **Gotina jinê dawiya dinê.**

- **Got: Tu ji kûye, got: ji mala kê zewicîme.**
- **Gora Elê, tifing bese.**
- **Gawirî qert, misilman nabe.**
- **Geh saz û geh sûz.**
- **Gotinek xweş buharek dilaye.**
- **Gerek mera cilê xwe ji avê derxe.**
- **Gul û miyê bi hev re naçêrin.**
- **Gul û sosin na pişkivin heya buhar netê.**
- **Gorî dêv yek sîlê lêdike.**
- **Gotinên te lingên bergîra dişkînin.**
- **Gû pir tevde bîn dide.**
- **Guloka dû bi dine de çû.**
- **Golik bi rêxin.**
- **Guloka gûye.**

**H:**

- **Hesin bi hesin dikute.**
- **Hebû miqlecîne, tinebû parsekcîne**
- **Hec bi weseka nabe.**
- **Heft avjanî keran hene, demê dikeve avê tevan ji bîr dike.**
- **Heft kufte hatin perakî.**
- **Heft lawên Tûtê hebûn ê tevî çê kûnde bû.**
- **Herîniya hespî çê li piş kêla cê.**
- **Hebûna nezana zikê zanedana.**
- **Her çêlek tê dotin, lê her giliyek (gotinek) netê gotin.**
- **Her xanek di dilê xwe da siltanek.**
- **Her sebrek xêrek pêre heye.**
- **Hesp, siwarê xwe nasdike.**
- **Heta mirinê dixebitê li kirinê.**
- **Her qazî ji aqilê xwe razî.**
- **Heya genim firîke mele şirîke.**
- **Hate kuştin, çi siwar çi peya.**
- **Hewiyek min bû ez jîr bûm, qîzek min bû ez pîr bûm.**
- **Hat ji felatê bû xwedanê welatê.**
- **Hîne marî bi çûke serî biceliqîne.**
- **Hink hinguv duxin hinek jî mêş pêda didin.**
- **Heft kulam huliye hene tev li ser hurçê ne.**
- **Heleb ne li vire lê gazê li vire.**
- **Her carê got ey pezba, dar-berê tijî biba.**
- **Her kesekî baqil (zana) serî taziye, lê ne her yekî serî tazî baqile.**
- **Hurç bi mezinî na-elimê reqasê.**
- **Hesino xwe bi xwe bi pesino.**
- **Her gundekî sergoyekî xwe heye.**
- **Her malekê kebînak xwe heye.**
- **Herdu perçeyên pişkulê wek hevin.**

- **Her ku kûçikek rewî tu kevirekî bavêjêye, dê kevir ji dinê xelasbin.**
- **Heft av di devî xwe werdan.**
- **Her por zerekê simbêl soreke wê heye.**
- **Hilma xwe ji çiyaya gewir hiltîne.**
- **Ha gû riye, ha nav çûye.**
- **Her tirek bi lawikekîye.**
- **Her carê qeherî kûnê xwe di sêlê dide.**
- **Heya bi qulê (çalê ) ajot.**
- **Hespî çê zengiya nagîne xwe.**

## **Î:**

- **Înan nekir mêr bike, mal heyştekê dewî dike.**
- **Î (kesî) ku çoya doxe ne wek yî dêjmêrêye.**

**J:**

- **Jor bi kirê dayî.**
- **Jîjo bi zaroyê xwe re got: herîrî ji hêrîro.**
- **Ji feqîriyê (perîşanî) mirov ji nêrî re got: keso.**
- **Ji deve de ketî, ji hop-hopê xwe namîne.**
- **Ji kera pirtir kes kara nake.**
- **Ji mêra mêr dibin, ji mêrka mêrik.**
- **Ji ser ve qubeye, ji hundir ve tirbeye.**
- **Ji ber baranê revî bin şurkê.**
- **Ji neçarî mera xatûna jî distîne .**
- **Ji neçarî mera (yek) goştî dîka jî duxe.**
- **Ji kera re tim bi bilûrê de.**
- **Ji axê pirtir, mar bi qinyat duxe.**
- **Ji xoce azane.**
- **Ji tirsa şîr re pufî dêw kir.**
- **Jê ket û bi pê ket.**
- **Ji koraye ku, tev korin.**
- **Ji ku tirsî li wir pirsî.**
- **Jin heye, mêr zêdeye.**
- **Jin stûna malêye.**
- **Jin dîwarê hundire, mêr yê dervaye.**
- **Jinê dilkir, dîwar qulkir.**
- **Ji pêl – pêloqa netirs, ji nerm – nermok bitirs.**
- **Ji were adete ji mera robete.**
- **Jin hin kila çavane, hin kula dilane.**
- **Jin; an mal û mêr, an tev û bêr.**
- **Ji bo sergîna cû Metîna.**
- **Jina ne delal çavên mêra dêşîn.**
- **Jinê ku seriyê xwe li ser du balîva bibîne kes pê nikane.**
- **Jinê çê li ber devî dergûşê bêlî dike.**
- **Jin pir bûn şîv dişewitin.**
- **Ji şîrî heya bi pîrî.**

- **Ji qirikê, yek bi don nabe.**
- **Ji bona xwedana, kevira navên segana.**
- **Ji heriyê derxist kir diriyê.**
- **Ji nîskê dike gîskê.**
- **Ji qehra şivana kûna xwe da govana.**
- **Ji qehra cîrana re kûna qiçikê (zaro) xwe derxist.**
- **Ji nexweşa re çû  zebeşa.**
- **Ji xezalê bezotir tinene, rizqî xwe duxe.**
- **Ji te wêda şev-reşiye.**
- **Ji simbêla dike di riha dide.**
- **Ji bezê em nagînin lêxistinê.**
- **Ji heft berdûşa zozikek çêdibe, ji heft zozika şopikek çêdibe, ji hft şopika qopiqek çêdibe.**
- **Ji xelkê re gule, ji xwe re kule.**

**k:**

- **Kes nabêje kanî bavê te, tev dibên kanî diya te.**
- **Kes nabê dewî (mastî) min tirşe.**
- **Kûçika tim biqusîn nabin tajî.**
- **Kino navê li mino.**
- **Kûnê tirek nanê ciheyî maneye.**
- **Kera li cem hevdu girêde, ji hev di-elimin tir-fisa.**
- **Kurmî darê ne ji darê be, dar nakeve.**
- **Kumî Xelo dide serî Welo û yî Welo serî Elo.**
- **Kûr bajo, hûr bajo, ga mêşîn.**
- **Kurî ketin pêşiya kera.**
- **Kerê nemir biharê tê, pîrê nemir pincarî tê.**
- **Ka ne ya tebû, ma kadîn jî ne ya tebû.**
- **Kûnê reş û sipî, dê li ber gêçût bêlî bikin.**
- **Kûnê mera çiqas pîse, ji mera nabe.**
- **Kûçika nal dike.**
- **Karê rovî li cihê teng çiye.**
- **Kevir tol dibe li cihê dûz diskine.**
- **Kevir li cihê xwe girane.**
- **Kevir li kêvir keve, karê Aqûb jê derkeve.**
- **Kûçik (seg) li ber derî xwe xedare.**
- **Kerê gote tirt, min aqilê xwe girt.**
- **Ker bi kerbûnê (kerrîtiyê) xwe di rêkekê re here û bikeve ticar din têre nare.**
- **Koza berxa li ber qula gura.**
- **Kûnê xwe yê mirîşkaye, dixwaze hêlînê (hêkê) qaza bike.**
- **Ker bi temê zeterê nizane.**
- **Kiyê buxe, kiyê li xwexe.**
- **Kero mîvanê hero.**
- **Kêleke kepekî din buxe, dê bi yekî din be?.**
- **Kirês ji şeytên dibire (dike).**

- **Kunciya di çewêl de dêjimêre.**
- **Kurmênc bi dengkirin bide, xwe bi xwe gêr dike.**
- **Kefa destê min bi bîn bû ?!**
- **Kîjan kevirî rake ewî di bin deye.**
- **Kevirî hewre çîk nade.**
- **Kesî sifrê xwe li ser rê rêxitî?.**
- **Kela mêste.**
- **Kevirê koşaye.**
- **Komkir ji deriya, da xêra miriya.**
- **Kûçkî nizane birewe mêvanan tîne xwediyan.**
- **Kêl mirin, temrî sor bûn.**
- **Kerê got: kuriyê min bibe, barî min dê sivik be.**
- **Karê îro ne hêl siba.**
- **Kew li hember kêw dixûne.**
- **Ka û kizin nabin yek.**
- **Kerê xwe girêde, teslîm Xwedê ke.**
- **Kûçik ji xweşiyê pîsiye naxe.**
- **Kûçik pêle dûvî hev nakin.**
- **Kûçikî xayîn ji nişkava bi mera digre.**
- **Ker dimre kurtan dimîne, mirov dimre nav dimîne.**
- **Ker kere eger ku, xezîna paşa tev li sere.**
- **Ketinê ji keran pîse.**
- **Kes nakeve tirbê kesî.**
- **Kunî avê li rêyê avê.**
- **Kêl ê mana tijî nabe.**
- **Kumî xwe daniya û li sera digere.**
- **Kûçkî har belê xwe dibîne.**
- **Karkerê mala xwe be, şêrînê hevalê xwe be.**
- **Karê Fate-tîzêye.**
- **Kerî ketî, li newala digere.**
- **Kebanî, ger, bê meşk jî dêw bikeyîne rûn pê dixîne.**
- **Ka keça gulî qutkirî, ka kebaniya ku xwe di dengizê werkirî, ka cotariyê misas di erdê de windakirî.**
- **Kurê Mencê çû qezencê.**
- **Kerê bi tûr de rît.**
- **kerê li ber derî rît.**
- **kêndirê "benî" vira kine.**

- **Kesî ne li govendê; govend valaye.**
- **Kundir mezin bû, ustû li xar bû.**
- **Kûçikekî li ber derî girêdayî, ji sed şêrî berdayî çêtire.**
- **Kêndir di derê (cihî) zirav de diqete.**
- **Ker bi zeterê zanin?.**
- **Kevir ku ji cihê xwe tolbe, dê bi çel perçe be.**
- **Ker dê bi defa çibikin, kor bi çira çibkin, dîn bi şîreta çibkin.**
- **Kalê bê kesî, pîra bê nefsî, herdu li halê hev pirsî.**
- **Kevirê havînê bavêj qulînê.**
- **Kor korê Xwedêne, nîv kor hêviyê jînêne.**
- **Ku bê çengê min, tê bivînî rengê min.**
- **Kurmancî têre xanî (xew) jê re xêre.**
- **Kurtikî coxe, dew tine buxe.**
- **Kurê gura, ne bê bav û bira.**
- **Kuştin heye, reva mêra tineye.**
- **Kurik (lawik) heye gula bavê xwe, heye kula bavê xwe.**
- **Kuştin a mêrane, çewt a jinane.**
- **Kê mirî vegerandî, yan dilkirî.**
- **Keç û kurê malê, gula dê û bavê.**
- **Ker û gêj, guhê wan tijî qirêj.**
- **Kes weke jinê bi mêrê xwe nizanê.**
- **Kew li kundir ket, ne kundir li kêw ket.**
- **Kirîfî ku def ne dirand xêra wî çiye.**
- **Karî te Hesen Elîkiye .**
- **Kotek ji cinetê derketine.**
- **Kutikî kevin ji mertê (marc) re hilîn.**
- **kefen dirand.**
- **kale _ pîr piştê kaşa dişkînin, kaş piştê ciwanan dişkîne.**
- **Kûnê xwe yê mirîşkaye dibê bila em hêkê qaza bikin.**
- **Kar, bazingê zêriye.**

<u>**L:**</u>

- **Li ser riya Helebê li derziyê digere.**
- **Li şûna şêra, çeqel û rovî dimînin.**
- **Li kerên ketî digere, ku nalên wan jêke.**
- **Lêv ji didana li pêşin.**
- **Li ber şer kes nikare destê xwe bide simbêla.**
- **Li zikê wî da, got: ay pişta min.**
- **Law dike karê bavê, dot dike karê dê.**
- **Li ser qulê şora rûniştî.**
- **Li ser riya Heleb li nala digere.**
- **Lingên êşeka netên ser doşeka.**
- **Li devî te xwendine.**
- **Lingî xwe qasî cilê xwe dirêjke.**
- **Li kerê nîştî li kurtên digere.**
- **Lêvek li erdê yek li ezmana.**
- **Lênîştinê kerê carekê eybe (şerme) dahatin du cara.**
- **Li benda yarê bê jin ma.**
- **Li me bû etarê dimis.**
- **Lingo timî li nav gundo.**
- **Li şûna şêra duxwîne pepûk û kunde.**
- **Li rêxa buharê şimitî.**
- **Lîstikê te wek yê hurçaye.**
- **Li şûna ku dêkê (diya) min digrî bila ya wî bîgrî.**
- **Li şûnê kilde kûrkir.**

# M:

- **Mîvano rûne heya êvarî, şîvê bikel heya buharî.**
- **Mihî bi lingê xwe, bizin bi lingê xwe.**
- **Mihî pêle berxî xwe nake.**
- **Miriya pir misde, tir-fisa dikin.**
- **Mirî bi xêr be, feqe bi ser de tê.**
- **Min rezek dayê, wî goşiyek tirî neda min.**
- **Mirina bi êlê re dewate.**
- **Mêş li rû bine, dê bi çel perçe be.**
- **Metirs ji çemê dike xuş-xuşe, bitirs ji yê hêdî dimeşe.**
- **Min tu li jêr û jor dît.**
- **Merî (mirov) bi findiqiya bi deriyê xelkê keve, ewê bi pana bi deriyê wî kevin.**
- **Merî li hespî xelkê siwar timî peyaye.**
- **Ma kûnê mera qawîne xelk bînke.**
- **Mar çiqas ji pûngê xûliye li ber qulê (poz) şîn tê.**
- **Mal-mala gure ne arde ne bulxure.**
- **Ma tu bi du seriyaye.**
- **Mîvan ji mîvên heznake, xwediyê malê ji herduwa heznake.**
- **Mirov pirin tev bi şaşik û kumin, hinek jî dewarî yek simin.**
- **Mirîşkê xwe bi kevokên hevala re nefirîn.**
- **Ma tu kê bifirî?!.**
- **Mirinê tu bi xêr hatî.**
- **Me ardê xwe pêt û kepeka xwe rêt.**
- **Me got: lawê axê me bû mixtar pişta me bû zinar.**
- **Morîkên qul bi etara re namînin.**
- **Merî ket golê ji baranê natirse.**
- **Mîvanê mal di gund de.**
- **Mîzînê mera bi dest xelkê deye.**
- **Min got yek, wê (wî) got dudu.**

- **Mirovê zengîn dilê xwe bi gûyî xelkê, dîsa, dimîne.**
- **Merî har bi ser kêrê xwe de bikeve.**
- **Ma destê te di bin kêvir de bû.**
- **Meriya bikuj û xwe çek (bavêj) piş.**
- **Me re ku bi mirîşka ra da û stand, hertim niklî me ra êkê di gû debê.**
- **Mar hîne bi çûke serî biçeliqîn.**
- **Masî di gola de netên bazarkirin.**
- **Merî (mirov) ê çê, nav û deng jê xelas nabin û yê pîs kul û derd.**
- **Min gotina te bi şêkir birî.**
- **Merî gîsînê bi herî hilgirt, erd pirin.**
- **Merîyê kulamcî (dengbêj) jê re heye cî.**
- **Mar dûvê xweyî qut ji bîr nake.**
- **Mala bûkê bi def û zurneye, mala zêve hajî tineye.**
- **Me ra rêyê giştî şaş dike, lê rêyê devî xwe şaş nake.**
- **Malm yê tembel berî yê zalim xera dibe.**
- **Min daye nav avê, ha giha çogê ha giha navê.**
- **Malê mera hin buheşte hin dojehe.**
- **Me got şêr, derket roviye.**
- **Malê pîrê ji mala mirî çêtire.**
- **Mezinê gura be û ne çûkê bira be.**
- **Me ra li cem kaniya tihî nabe.**
- **Mal bê ard dibe, lê bûk bê benîşt nabe.**
- **Mirîşkê nuh rabin hêkê hesinî dikin.**
- **Malê ne ji yî çê re bike û ne ji yî xerap re.**
- **Merî ku bi xwe bikeve nêşe.**
- **Mêr lêmiştin, jin golin.**
- **Mirov bi pirsê diçe qursê.**
- **Min bûkek anî bi lez, sivika male dîsa ez.**
- **Mir îşa reşe hero ne xweşe.**
- **Masî ji sêrî de digemire.**
- **Mêre li gotinê, jin li sira mirinê.**
- **Mirin teva dike yek.**
- **Mirinê kûçika hat, di davê mizgefta de gû dikin.**
- **Mûş xwemûşe, pişta wî alqûşe.**
- **Mêrê du jina bi xwe re dijmine.**

- **Meriyê xerîb kore.**
- **Mala min li pişta mine.**
- **Mûja ji dûvka dikin.**
- **Mera li hember te avis dibe.**
- **Merî çû gunda, payê xwe hinda.**

**N:**

- **Ne gundê bê şivan û ne mala bê mêvan.**
- **Ne ji defê re dibe û ne jî ji zurnê re.**
- **Nanî xwe neke tûrkî hevala.**
- **Ne ker ket ne hîz dirî.**
- **Navî te li bin dûvî kerê yazikirin e (nivîsandin e).**
- **Nanî genimî di zikî her yekî de namin e.**
- **Nivşte çi kelê Xwedê ne hêştê.**
- **Navê yekî derneket çû di seriyê kaniyê de rît.**
- **Nîra lê badidin.**
- **Ne gundê bê rez, ne konê bê pez û ne jî mirovê bê ez û ez.**
- **Nîsanê dew li cem hemûyan pîsanê.**
- **Ne li mala min e nizane bihalê min e.**
- **Nanê şil ketî zik.**
- **Ne li ber cavê min, dûre ji dilê min.**
- **Nîvî mêraniyê bi revêye.**
- **Ne sala bê buhar, ne pîra bê guhar.**
- **Navî girane, mezelî wêrane.**
- **Ne xema mine, ne dema mine, qîr.. qîra benîştê min e.**
- **Ne sora ber agira, ne rinda bê çira.**
- **Namirim tîra pêra, dimrim dîlber pêra.**
- **Nan ast, xeber rast.**
- **Ne duxe û ne dide hevala, genî dike davê newala.**
- **Nîsk nokê me bi hev re nakelin.**
- **Nav ê mine, xwerin a wane.**
- **Nav didanê min negirt.**

## **P:**

- **Pezê  bê şivan, gur lê civiyan.**
- **Perispanî sipî li yê reş nexe.**
- **Pirêzê te bi genim be, çûk dê ji Hemayê werin ku lê biçêrin.**
- **Pere gemara destên camêraye.**
- **Pez bê şivan nabê.**
- **Pisîk neyî li male, mişkî belebane.**
- **Pisîk li male, mişkî ebdiruhmane.**
- **Pera bi gurzke û jina pirske.**
- **Palûtek nare kûnê.**
- **Pîrek çûn hewar, zilam ketin kewar.**
- **Pîşê we bax û bustan be, paş we agir û dûman be.**
- **Pezê ku ji kerî biqete para gure.**
- **Pîr bû ji bîr bû.**
- **Pîra jîr şîrê xwe narjîne.**
- **Pir şora, ker dan gura.**
- **Pezê bê şivan, şivanê bê seg, mal lê dibe talanî.**
- **Pişkul çûn bajêr bûn leblebok.**
- **Pezê bê şivan e.**
- **Pîrek di reşiyê de, qîzek di xweşiyê de.**
- **Pîrê nemir pincarî tê, kerê nemir buharî tê.**
- **Palte, simbêla nabire.**
- **Pînkê mera ji qesrê xelkê çêtire.**
- **Pere pêşin de, mal pêşin de.**
- **Porî me diweşe.**

## Q:

- **Qîz embarên pîvazane; çiqas te hêşt wiqas digemirin.**
- **Qîz wek lepê heriyêne her çilpikek bi derekê dipijiqe.**
- **Qeşmer bi civatê dikene û civet bi wî dikene.**
- **Qazik digere, qapaqê dibîne.**
- **Qîret bikin ji fikrê kerê, ji eslê xwe qet danagerê.**
- **Qîza fedok bi gundekî, xortê şermok bi kundekî.**
- **Qurşî  xweyî sipî ji rojên reş re veşêre.**
- **Qumçî zêrî xwe nas dike.**
- **Qiçik ku negrî dê çicik nake dêv.**
- **Qulpan bi hêkan vedikin.**
- **Qatî jor bi kirê dayî.**
- **Qiçikî bi çûk li ser tirbê xwe dilîze.**
- **Qusûr a çûkaye lêborîn ya mezina ye.**
- **Quruş tim çel  pereye.**

**R:**

- **Roviyekî xerap ku bigere ji şêrekî rûniştî çêtire.**
- **Rovî têre, tirî tirşe.**
- **Rovî neçû qulê kaşanek bi dûvê xwe xist.**
- **Rihî dibe bost, dijmin nabe dost.**
- **Rezîlî li quto dewate.**
- **Rind bû û bi min û gund bû.**
- **Rojê çû ava venagerê.**
- **Rûnişt li germa rabû li serma.**
- **Rojê xweş di sibê re xûyaye.**
- **Reş bi beş kenî, beş bi boş kenî.**
- **Rizqî kund bi xwe tê.**
- **Riyê mera ne hesinin.**
- **Rêkê dipîve.**
- **Rovî negihîşt tirî got: Bila xêrê dê û bavê be.**
- **Rovî negîşt tirî got:Tirşe.**
- **Ron di tûra de netê veşartin.**
- **Rojin hilhatine û neçûne ava hene?.**
- **Roviyê ku ji mirîşkên xwe re mezinkiriye.**
- **Ronê me bi îzê me ve.**
- **Rojek êkê bi seriyê sêwiya keta, golikan bi seriyê kaniyê de rêxkirin.**
- **Roja dûman, kêfa guran.**
- **Ronê ku ji axê brief bûye.**
- **Riwê wî bi nanê germ re nakene.**

## S:

- **Serî te bi ard be û tu bêjî ezî ji êş têm, ez ji te bawer nakim.**
- **Silav li miyê ye ne li riyê ye.**
- **Siba lîtirê encûra, dê were du qurûşa.**
- **Serî xwe neke her hefsarekî.**
- **Sêveke û kirine du perçe.**
- **Seriyê mêra çiyayên bi dûmane.**
- **Serîk şortane, pêlek xizane.**
- **Saqo li yaqo.**
- **Selûr-pelûr ketin paş belûr.**
- **Sîfîlî "perîşanî" kirasekî kine, kirasekî ji êgire.**
- **Serî ku nêşe çekiya nadin ber.**
- **Serî ku nêşe kundir jê çêtire.**
- **Seriyê mêrê çê her bi mij û dûmane.**
- **Sirtên bilind vê ba nabin, newalên kûr vê av nabin, seriyê mêrên çê vê êş nabin.**
- **Seina (zerka) min neşkî lê çingiya.**
- **Seriyê çel newalî, newalek dibere û serî heft şora şorek dibere.**
- **Seriyê ku ji dê derket nema vedigerê.**
- **Sîngî tirsok vehesê nabîne.**
- **Sal, mîna hawîşa tên û diçin.**
- **Serî mera ku, li ser-heda nekeve mera şiyar nabe.**
- **Serî mera ku, li kevirî ezîziyê nekve mera baqil nabe.**
- **Ser çoyî xwe vedide.**
- **Sê ar hene: Ar, eşq, sîfîlî arî ser êrê.**
- **Sozêd kevin malê mera xera dikin.**

## **Ş:**

- **Şêr şêr e çi jin e çi mêr e.**
- **Şêr kal bibe dibe pêkenîna roviya.**
- **Şev ku çiqas reş be tukê jê reştir be.**
- **Şor bûn, şorbe nebû.**
- **Şerî no "xort" rev gereke.**
- **Şekir li devî te.**
- **Şûjinê ber cavêd xwe nabîne, derziyê ber cavêd hevala dibîne.**
- **Şand diziyê di pişt re da firîziyê.**
- **Şerî hat ber derî li ser serî.**
- **Şor-pir bayî kur.**
- **Şerê sibê ji siwarbûna êvarê çêtire.**
- **Şeva reş li êvarê diyare.**
- **Şeva tarî xelatî mêrane.**
- **Şerî wehşa li nav garisî me bibe!.**
- **Şor ji mirdara, sipî ji Qepala.**
- **Şorê durust kevçiyek zihêr vêreye.**
- **Şor-nêre.**

## T:

- **Te gihande ga û masî.**
- **Tajî ku bi zorê here awê, dê çi awê bike.**
- **Tir bi dîna çejin û dewatin.**
- **Ti gul bê mit "sitirî" tinene.**
- **Tim bociya biqusîn nabin tajî.**
- **Tiştê dûre bi nûre.**
- **Tevirekî bê dûve.**
- **Tevî dosta cot bike, ariş-vêriş neke.**
- **Teyir (çivîk) hemû dijminê kewê ye, kew dijminê cane xwe ye.**
- **Tuyî bûye roviyê ku, li Ferêt guhdarî dike.**
- **Tûrikî maneciya qule.**
- **Tuyî bûye xwediyê miş mişê.**
- **Tu ne li mala min e, nizanê bi hale min e.**
- **Tuyê bûye nasa meqesê.**
- **Tuyî bûye mirîşka hêk pêre.**
- **Tu bî tu komirê xwe neşewtîne, yên loma bikin pirin.**
- **Te çima, wek kuriyê buharê, poz rakirî.**
- **Tu wek ava bin kayêyî.**
- **Tiliyên te giş ne wek hevin.**
- **Tu yekê zanî û duhan nizanî.**
- **Te çi çand, ewê şîn bibe.**
- **Ti dar serî xwe gihîştine ezmana hene?.**
- **Ti gelî bê deng bûne.**
- **Tirî li tirî dinêre reş dibe.**
- **Tu defeka (daholeka) bê dengî.**
- **Tu dixwazî tirî buxe an bekcî kutekî.**
- **Tu karî bi zorê hespê bibî ser avê, lê tu nikarî bi zorê avê bidiyê.**
- **Tuyî bûye kalê Piço.**
- **Te dibînim bi bîra xwe tînim.**

- **Ti agir bê dûman tine ne, ti dûman bê agir tine ne.**
- **Tê bibêjî min mêrekî xwe kirî.**
- **Ti ker ku buharê nezirin hene?.**
- **Tu wek pîrê milik-dase.**
- **Tu yê bûye pîra çînciqle.**
- **Tu li paş kerê hat dîtin.**
- **Tu yî bûye golikê enî-beş.**
- **Teneyek cihe narê kûnê te.**
- **Tu yî pêle kelekan dike.**
- **Te pêle textê çirûk kir.**
- **Tepên te wek ên jinebiyan e.**
- **Tu bû erebê tir kirî.**
- **Tu bû heyva çejina.**
- **Tu wek kerî ne ziriye.**
- **Tu yî bûye Hesê kose.**
- **Te bi destê xwe kir, tuyê bi ustûyê xwe bikşînî.**
- **Tew dilo, dara bê çilo.**
- **Tukê bi hêlkê Xwedê bigrî.**
- **Tirpa sêrek bikin.**
- **Te sêwiyek li kuderê dît, seriyê wî berjêr bik.**
- **Ti seriyên kêl di bin kuman de tinene.**
- **Te îro ne bi min, min ji duh ve ne bi teye.**
- **Tiştên dilan nayên milan.**
- **Tu yê bêje ku min jehir "zihêra" marê reş daye wî.**
- **Tu yê bêje ku min nan xwarî, wî perçe.**
- **Te cavê şeytên kor kir?!.**
- **Tu yê li Edenê avê vexî.**
- **Tu yî bûyî şopikî dewata.**
- **Tu yî bûyî gayî zexel.**
- **Tu xwe li ber baranê şil dikî.**
- **Kevirî ku ew lê birî tavên buharê nikare pak bike.**
- **Tu yê bêjî ku ez goştî piyêd xwe dixum.**
- **Teyaqa didin ber dil.**
- **Tokî şeytên bi ustûyê şeytên dikeve.**
- **Tumehî gû bi mera bi xardin dide.**
- **Tu li çi bigerî tu yê wî bibînî.**

## V:

- **Vir bi kavirane.**
- **Vir "derew" bi qoçin.**

## W:

- **Wek roviyekî ku ji çiyakî qehriye.**
- **Wek wê kerî ku çov li nav cavan ketî.**
- **Wek marî bin zik zere.**
- **Wek kêrkiyê seqere.**
- **Wek nîskê  Tata ye.**
- **Wek tirê di ber gû re ye.**
- **Wek nokê çaqiriye.**
- **Wek encûrê keraye.**
- **Wek qatirê çamûşe.**
- **Wek wî masî di golê de ku, av ji ser qutkirine.**
- **Wek avê bin kayê ye.**
- **Wek findiqêye.**
- **Wek dermûçankî destaraye.**
- **Wehşî (hurçî) bi serî xwe ye.**

## X:

- **Xwedê gûza dide merî bê diran.**
- **Xult axê dikole, bi nav çavê xwe dike.**
- **Xwedê bide ji xet-nîvê dide.**
- **Xwediyê sebrê bû mîre Misirê.**
- **Xwedê çiya dibîne, berfê lê dibarîne.**
- **Xwedê mera bi kesê axnemez de nêxîne.**
- **Xanî wî wek mizkeftaye.**
- **Xar rûne, rast dengke.**
- **Xwîn nabe av.**
- **Xanî-loqkirî dilopa nake.**
- **Xwedê nanî şil neke zikî kesî.**
- **Xwedê royê li mera nebê ava, li binî Mîrka.**
- **Xêr li mera dibin xeyar.**
- **Xençera royên reşe.**
- **Xatûna ling bi paçike.**
- **Xwedê heye xem tineye, kevçî heye dew tineye.**
- **Xetê xar ji kerî mezin daye.**
- **Xira nebe çê jî nabe.**
- **Xebera xwe bibêj, pişt re birêj.**
- **Xaya xêra, rebena dêra.**
- **Xem kûre, mûm buhaye.**
- **Xewa pir-giran, merî ze`f-nezan.**
- **Xêr tê bi rêz, şev tê bi hêz.**
- **Xastin rû-reşiyeke, nedan du rû-reşîne.**
- **Xala xarzî rakirin, ama birazî.**
- **Xeta xar ji gayê pîr deye.**
- **Xeberê mezina, neşê berana.**
- **Xalî li seriyê tekim.**
- **Xêra bavê, bi tiliyê merayî kul de mîznakin.**
- **Xwe kirî tire başaqciya.**
- **Xemla tenê bi xwedana.**
- **Xaska diya te li şûna te tirek xwe kiriba.**

## Y:

- **Yê ku bulxur (girar) çand jî mir.**
- **Yî te cane û yî me bacane.**
- **Yê têr li hundir rûnişt û yê birçî li ber baranê şilbû.**
- **Ya ku me zanî jî me ji bîrkir.**
- **Yî dikişîne zane.**
- **Yê ku direve jî gazî Xwedê dike û yê dide dû jî.**
- **Ya ku ziman dibire, şûr nabire.**
- **Ya kin ji ya dirêj çêtire.**
- **Yên nuh hatin, ên kevin xilatin.**
- **Yek ne dizane li pêş te bimeşe an li pey te.**

## Z:

- **Zêtê li êgir dike.**
- **Zerika min neşkî li çingî.**
- **Zêrî xweyî sipî, ji rojên reş re ,bihêle.**
- **Zêr bi zêr bûna xwe motacî kepekê dibe.**
- **Zikê têr haje yê birçî tineye.**
- **Zaro negrî dayîk memk a nake dêv.**
- **Zîno bi Siltanê û Zelo bi leganê.**
- **Zirar ji cersiyê çêtire.**
- **Zaroyî bi tenê arvanê xelêye.**
- **Zik têr dibe, çav têr nabe.**
- **Zimankinî ji destdirêjî çêtire.**
- **Zerika min çelqî lê nerjî.**
- **Zor gêzera hildike.**
- **Zil-zil komkir mil-mil belakir.**
- **Zimanê xwe birî, ciyê xwe kirî.**
- **Zimanê sore, pêşî ne geliye ne zihore.**
- **Zikekî zozanî xira dike maleke mêranî.**
- **Zimane, ne kaşe ne kendale.**
- **Zimanê têr tim birçiye.**

## Nifr:

- **Avê reş bi çavêd te de were.**
- **Agir-dêpî ji te rabe.**
- **Ar (agir) bi bedenê te keve.**
- **Agir bi te keve.**
- **Çoyî te li dîwêra keve.**
- **Çavê te birjên.**
- **Çav bi teve li ba bibin.**
- **Di canî te de bi kulek ji kula leg-lê be.**
- **Derdekî bê derman bi te keve.**
- **Di canî te de bi çiqinê mara be.**
- **Di çavên te re bi derkeve.**
- **Ez ji ten e razîme Xwedê ji te ne razîbe.**
- **Ez li bîra gola hişînim ku tu herî û venegerî.**
- **Ê di navê me de di navê te keve.**
- **Gullîlkê te bi çavê te ve li ba bin.**
- **Gulîlkê te birjên.**
- **Heft qede bi te kevin.**
- **Heft qurşîn li te kevin.**
- **Jehra marî kor be.**
- **Kurm di te kevin.**
- **Kurmê kor di te kevin.**
- **Kurmê ser reş di te kevin.**
- **Kirasî teyî bi xwîn ji min re were.**
- **Makînak bê nimre li te keve.**
- **Marekî bê jehir bi te dade.**
- **Nan bi xezalbe û tu bi tajî be.**
- **Qurşînê seybê li te keve.**
- **Quran bi te keve.**
- **Qurşîn li dilê te keve di gurçikê te re bi derkeve.**
- **Şûna seriyê te bi geliyê şiyê be.**
- **Text-tacî te wergere.**
- **Tu ji her çava de kor bibî.**

- **Tu li ser linga herî, ser piştê vegerî.**
- **Tu ji wî ma, kes ji te nemîne.**
- **Tu were kuştin, neyê şûştin.**
- **Tu hefin-definî bibî.**
- **Tu ji gur birçîtir be, ji mar tazîtir be.**
- **Tu du kirasa li xwe nebînî.**
- **Tu qiçikên nêr û mê di mal de nebînî.**
- **Tu bi dîwara bigrî.**
- **Tu herî can-were bi jan.**
- **Tu li paş xwe nenirî û neb ê wer law, tim bêje were lê.**
- **Tu ser-ber herî.**
- **Tu bi ser kêrê xwe de bi kevî.**
- **Tu di axê sar bî.**
- **Tu ti miraza nebînî.**
- **Tu mirdar herî.**
- **Tu dêris bibî.**
- **Tu di mala xwe de nebînî bûk û zava.**
- **Tu xêr-xwaşîyê ji canî xwe nebînî.**
- **Tu hûr be li Kêrbela be.**
- **Tu li pê be li tirbê be.**
- **Tu di xerafak bê av werbî.**
- **Tu di tirbê xwe de çûç rûnî.**
- **Tewkê te di nav lingê te de be.**
- **Topa Siltan Silêman lit e keve.**
- **Tpoek li nav çavê te keve, tu tort-belayî bibe, hinek bibên (bibêjin) hebû hin bên (bêjin) tinebû.**
- **Tu mîzê lawî nêr li ser dawê xwe nebînî.**
- **Tamar-tamarê te ji erdê hilbin.**
- **Tu bi denga min nasbikî.**
- **Tu li pê bî goştî te li erdê be.**
- **Wek ku ez ji te razîme Xwedê ji te razî be.**
- **Xwedê merî birçî têr neke.**
- **Xwedê te têr-tijî neke.**

## (Tştik û Mamik):

1- dare, li ser darê hinare, li ser hinarê kopale, li ser kopêl riste, li ser ristê kulmiste. (Teşî) ye.
2- Kumê hûtik tijî nûtik. (hejîr) re.
3- Senderûk ser senderûkê, kilît di destê bûkê. (Destar) e.
4- Qasimê çû serê lat, lat anî xwar. (Dozan) e.
5- Apê te tê ji deştê, barek sitirî li piştê. (Jîjo) ye.
6- Binî di erdê deye, nîvî di kerê deye, serî di te daye. (Genim) e.
7- Kevir-kevirê sultanî, min li dora gund danî. (Erd) e.
8- Çi xaniyek damiştî, bilbil tê de rûniştî. (Dev û ziman) e.
9- Li ser refikê didê defikê. (Çire) ye.
10- Bi şev bûke bi ro pepûke. (Çire) ye.
11- Qutiya hec Bekir, kesî venekir. (Pîreka avis) e.
12- Fincan dor bi deq, heya Şam û şerq. (Heyv û stêr) in.
13- Qesreke sipiye, bê deriye. (Hêk) e.
14- Bi banî ketim du gulên geş, bi banî ketim du marê reş, bi banî ketim meydana xweş, bi banî ketim ev zala hûta. (Herdû çav, Birûh, Enî, Por) in.
15- Li latê (kêvir) xîn naşkê, li avê xîn dişke. (Pel) e.
16- Li latê (kêvir) xe dişkê, li avê xe naşkê. (Hêk) e.
17- Ne çandî li ser pişta nezayî, nezayî li ser pişta nelebitî, ne lebitî li ser pişta ne tebitî. (Xoyê, qatir, pir û av) in.
18- Ser text, bin text, di nîvî de Pîrek bê bext. (Kûse)e.
19- Delo dariye, bîr paçiye, av xuliye, eger tu zanibî çiye. (Kil) e.
20- Serî di te daye, kok di diya te daye. (Memik)in.
21- Ker zirî, pişkul firî. (Tifing) e.

**22- Şîrano li darano, darano li çar ling, çar lingo bi rêket, du lingo bi pê ket, vîz-vîzo bi dorê ket. (Etarê Tirî) ye.**

**23- Hilindir milindir law ji bavê bilintir. (Agir û dûman) e.**

**24- Reşe, ne jine ne bizine, kufta dike lê ne jine.( Kêzik) e.**

**25- Du-mîzok, du-mîzok, dumîzok. (Du mihî, zok) e.**

**26- Bi riya bi dar vaye. (Derî) e.**

**27- Apekî min heye bi riya bi dar veye. (Derî) e.**

**28- Apekî min heye tirbê xwe bi xwe dikole. (Dilop) e.**

**29- Sor û kurkirî di bin te de ramedekirî. (Doşek-nivîn) e.**

**30- Lêxe lêxe xedar dibe, guh bade dimre. (Papor) e.**

**31- Wî alî dar, wî alî dar, di ortê de segekî har. (Cercer) e.**

**32- Dor dar, qul hezar. (Bêjing) e.**

**33- Bi rêve derê paş xwe nanire. (Rê û çem) in.**

**34- Şev reşe, şûv reşe, mihî qembere, berxî li bere. (Zebeş) e.**

**35- Çûm gundekî mirov tê tine, min goşt xar hestî tê tine. (Zaro şîr dimije).**

**36- Sê pênc panzde û dudu hevde û sisê bîst. (Bîst) e.**

**37- Kîskê sorik, tijî morik. (Hinar) e.**

**38- Tiştekî min heye, evqas ka ye. (Ka) ye.**

**39- Di keve qulê ne mare, li ser du hêka ye ne kevoke, kurtan li sere ne kere. (Kîre-xire; çûka necêre).**

**40- Takê (dara) deştê ordek li ser piştê. (Garsî sipî) ye.**

**41- Şiva ter.. hilger. (Mar) e.**

**42- Çiqwas kûnê misde, kayîkê dike. (Meqes) e.**

**43- Şikefteke min heye tijî golikên enî beşin. (dev û didan).**

**44- Biroşeke min heye tijî dolmeye, ez tol dikim.. tol dikim, ew narije. (Hinar) e.**

**45- Kalekî min heye bi riya bi darvaye. (Derî) ye.**

**46- Tu çiqws jê bibî ew kûr û fireh dibe. (Kort) e.**

**47- Sê kalin, dudu bi kincên (cilên) reşin, yek bi cilên sipiye, ew dikevin şikeftê. Dudiwê reş dertên, yê sipî dernê. (Dendika cebeş) e.**

**48- Ka çû ma nok. (Ka û nok) e.**

## Mak*:

1- Eve lev (eve lem), deve lev, qûşo qember, çeltîk çember, mişko ember, tozil berber, hincik mincik, luibî cuicik, porî hincik, ketî quncik.

2- Pişkul, pişkul devê pişkul, diçêrînim, dimeyînim, avka zengê, xulxul bengê, gul fîdankê.

3- Yekê dukê dimoze, şemşê qutê repoze, kêçê mêçê hilqeçê, qere qoçik kuspeçik.

4- Hêvê hêvê, dendik sêvê, piş malanê, tulltek nanê, ez bi heyranê (qurbanê).

5- Hiştirek (deveyek) tê ji binê gulê, bi xum û xuşe, nav şeqa tijî kurm û kêze, kî dengê silê Fat gemarê gezkê, şekirê Şamê, gur-gup.

6- Kî dengkê-mengkê, silê Fatê emkê (teimkê).

..........................................................................................

(*) jimartina endamên lîstikê û ka wê maka kê bê; ji bo ku, ewên din xwe veşêrin.